

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

BIHAR 2007

- ŞAR Û KITAN
- EŞÎR Û MALÊN BÊŞQAWAXA MEZIN
- XELATA KURTEÇÎROKAN

33



# bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sê mehan carê derdikeve/Ûç ayda bir çikar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 33, bihar 2007

Ansvarig utgivare  
Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen  
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnişana li Swêdê  
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige  
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Navnişana li Almanyayê

Muzaffer Özgür/Bîrnebûn  
Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya  
Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyat

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):

Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

İsveç hesap numarası

(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası

M. Özgür, Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln  
BIC: DEUTDEBKOE  
IBAN: DE66 3707 0024 0591 2662 00  
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım

Türkiye

Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32  
KIZILAY / ANKARA  
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A  
Polatlı-Ankara  
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul:

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi  
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Eşa Erew ji Qerecedaxê, di baxçê xwe de

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re  
tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî, li  
xwedî nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û  
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wênêyên li bergê: Beşqewaxa Mezin  
Foto: Necati Kanoğlu/Mem Xelikan



- 2 Newroza we pîroz be! **Ali Çiftçi**  
4 Kursa rastnivîsa zimanê kurdî **Reşîd Karakuyu**  
5 Pirsî ziman û Kurdên Anatolîyê **Nebi Kesen**  
8 Şar û kitan **Mem Xelikan**  
12 Bêşqewaxa Mezin **Necati Kanoğlu**  
18 Gundê Qemera **Resul Altuntaş**  
20 Encama pêbirka kurteçîrokan  
21 Zêbik **Bekir Darî**  
28 Fedekarî **Mem Xelikan**  
31 Sepana Qîto **Abdulhalik Duran**  
34 Pêketin **Berzan Çelebi**  
37 Çavşîlanê **Mem Xelikan**  
38 Çarîn **Omer Xayam**  
41 Kilama şînê **Altun Başaran**  
43 Bêtar **Nuh Ateş**  
55 Ji Anatolîyê heta Amsterdamê **Rohat Alakom**  
59 Kejê **Seyfi Doğan**  
63 Gelinsîz, damatsız bir köy düğünü hayalî! **Hatice Polat**  
64 Orta Anadolu`da reşvanlar **Vahit Duran**  
73 Lista nivîsên Bîrnebûnê, (hejmar 1 - 32)



## Newroza we pîroz be!

Ji hejmara zivistanê vir ve gelek bûyerên xweş û nexweş rûdan. Di vê navberê de hinek nas, dost û hevalên me, merivên xwe yên nêz wende kirin.

Hinekan ji can û cigera xwe, zaro-kên xwe yên ciwan û xort, hinekan hez-kirê xwe, hinekan dê an bavê xwe, hinekan hevala an hevalê xwe yê nêz û hinekan jî xwîşk an birayê xwe wenda kirin. Ji wan hinek pir zû, di xortanî û ciwaniya xwe de, hinek di umrê xwe yê mezin de çûn ser heqîya xwe. Rehmeta xwedê li wan be!

Birêz Mistefa Mix, ji deran dûr be, xwûşkeka xwe di qeza trafikê de, endamê redaksiyona me, birêz Îhsan Türkmên jî hem xaltî û hem jî xasûya xwe, ji endamên Waqîfa Kurdên Anatoliyê, Harun û Ali Coşar bavê xwe, Tewfik û Guldane Bal keça xwe ya bi navê Dîlan, xanima hunermedê hêja Gursel Qemerî di vê destpêka biharê de wenda kirin. Em li vir, li ser navê redaksiyona kovara Bîrnebûnê, dibên; serê we sax be!

Prof. Şekroyê Xudo Mihoyî, doktorê zanyarîya dîrokê, di 1ê sibata 2007an de li Moskovayê, di 77 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Nedîm Dağdeviren, berpîrsê Kitêpxana Kurdî li Stockholmê, ji ber nexwaşîya kanserê, di demeke kurt de jiyana xwe ji dest da.

Em li vir ji malbat, heval û hogirên wan re sersaxiyê dixwazin.

Ev destpêka biharê pirê caran ji bo kurdan bûye êş û keder!.. Lê jîyan, xweşî û serhildanên kurdan jî, her bi destpêka biharê re bûne.

Kawayê Hesinger, li gor riwayetê, di 21ê adarê de li hember Dehaqê zulumkar serî hildaye û dawîya zulum-kariya wî anîye. Ji wê rojê vir ve ye kurd di 21ê adarê de, li derên herî bilind agirê Newrozê, li ser axa Kurdistanê dadidin.

Bi hestên berdewamiya jîyanê û ser-xwebûnê, em di destpêkê de ji van hemû malbat, nas û dostên ku me li jor navên wan nivisîne û yên ku me nika-ribûye binivisîne re dibên; êşa we êşa me ye jî. Lê mirin û jîyan di zikê hev da ne. Bê hev jî nabin! "*Hinek derin û hinek tîn.*" Ev jî yek ji parçeyê jîyanê ye. Bila Newroza we her pîroz be!..

Bi hêviya jîyaneka bê keder û serkeftî em ji hemû xwendevan, nas û dostan re Newrozeka xweş ji dil dixwazin.

Ev hejmara jî li ser çand, ziman û folklorê ye. Herwiha encama pêşbirka kurteçîrokan jî wek dereca yekemîn duyemîn û sêyemîn hatine çap kirin.

Bimînin di xêr û xweşiyê de!

**Ali Çiftçi**



## **PÎROZBAHÎYA DEHSALÎYA BÎRNEBÛNÊ**

Rasterast deh sal buhurîn, di nav van deh salan de li dinyayê, di naturê de, di civatê de gelek guhertin çêbûn. Guhertineke pir piçûk jî ev bû ku deh sal berê Bîrnebûn derket. Di van deh salan de 33 hejmar, bi gotineke din nêzî 3000 rûpel bi navê kurdên Anatolîya Navîn, li ser kurdên Anatolîya Navîn bûn dokument: Kinc û kofiyên jinan, dîrok û serpêhatiyên kurdên Anatolîyê, wêne û qedera wan, çîrok, zargotin û henek/yaranî, ziman û adetên wan û gelek tiştên weke van tiştan di van deha salan de di rûpelên Bîrnebûnê de hatin raxistin. Bi pîranî bi zimanê kurdî û hinekên wan jî bi tirkî.

Li gel kêmasî, zehmetî û netemamiya hinek tiştên xwe jî em bawer in ku Bîrnebûn ji bo kurdên Anatolîyê bû navgîn û meydanake agahiyê.

Kovara Bîrnebûnê ne tenê ji bo kurdên Anatolîyê, herweha ji bo kurdên parçeyên din jî bû tiştêkî aşîna ku ew li ser kurdên Anatolîyê bibin xwedîzanebûneke berfirehtir. Tiştê ku em pê dizanin bi hebûna Bîrnebûnê re, gelek kurdên me yên Anatolîyê dest avêtin qelemê, jiyana xwe, çîrokên xwe, gundên xwe, hîssên xwe bi zar û zimanê xwe nivisandin û xwestin îdentîteya (kesayetî) xwe lokalîze bikin û xurt bikin.

Em pê serbilind in û hêvîya me heye ku Bîrnebûn ê di deh salên pêş me de vê erk û xebata xwe baştir û tekûztir bike.

### **Agahdarî:**

Bi minasebeta dehsalîya Bîrnebûnê em ê di **2007-04-29** de li Stockholmê şeveke pîrozbahîyê amade bikin.

Cîh: Restauranga Mozaîk

Kesên ku bixwazin bên dikarin ji van telefonana agahdarî werbigrên:

Tlf: + 46 (0) 70-37 65 670 (Harun Coşar)

+ 46 (0) 70-88 84 197 (Hemîd Atmaca)

# Kursa rastnivîsa zimanê kurdî

## Reşîd Karakuyu

Me di payîza 2006an de endamên Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn, bi mamostetiya Amed Tîgrîs dest bi kursa rastnivîsa zimanê kurdî kir.

Beşdarên kursê Hemîd Atmaca, Hecî Baysal, Mecit Çifçi Yusuf Güler, Mahmut Baran, Harun Coşar, Raşîd karakuyu û Ali Çiftçi bûn.

Ji derî van kesena çend kesên din jî car caran beşdar dibûn.

Ev kurs heta destpêka havîna 2007an ê berdewam be.

Herçiqas beşdarên kursê xwendin û nivisandina bi kurdî diza-



nibûn jî herdem pêwîstiya wan bi perwerdeyîya sistematîk û zanistîyê hebû. Kurs ê vê kêmasîya temam bike.



Ji kursê: Harun Coşar, Hemîd Atmaca, Reşîd Karakuyu, Yusuf Güler, Mahmut Baran, Mecit Çifçi

# Pirsa ziman û Kurdên Anatolîyê

## Nebî Kesen

Di rojeva kurdan da pirsa parastin û hînbûna zimanê kurdî cihekî girîng digrê. Li ser vê babetê berî du sê salan niqaşek di navbeyna hemû hêzên kurdan de dest pê kir û hin jî berdewam dike. Bi pirsa zimanê zikmakî û perwerde girêdayî, li Amadê û bajarên Kurdistana Başûr civîn û konferansên ziman pêk tên. Li Ewropa jî di vî warê da xebat û hewlên kurdan pir dibin. Di wan civîn û konferansan de zimanzan û pedagogên kurd ditîn û pêşniyarên xwe niqaş dikin û bi hev re li çareseriyên digerin.

Tevgera kurd, bi zanayîya vê pirsê, gora îmkanên xwe hemberê bîrkirîna zimanê kurdî û asîmîlasyonê kar dike. Rojname, pirtûk, televîzyon û malparên internet yên kurd wasîteyên van nîqaş û xebatê ne. Lê ev ne bes e, çima ku kurd li Tirkîyê, sê parçeyên Kurdistanê û dewletên din yên dinê di dibistan û jîyanê da bê îmkanên parastin û hînbûna zimanê dayika xwe ne û roj bi roj kurdî bîr dikin. Bê şikl, kurd çiqas xwedî li nasnameya xwe derkevin jî, bê ziman nikarin wek

netew pêşva biçîn yan jî xwe biparêzên.

Rewşa kurdên Anatolîyê ji aliyê ziman û çandîya kurdî de ne baş e, bi gotînek din, ji rewşa kurdên din cûda nîne. Belê, şertên, ku kurdên Anatolîya tê da ne, yên din in. Gundên kurdan di nav gund û bajarên tirkî da ne û zimanê tirkî ji bo tirkîyên hevaltî, bûrokrasî û bazirganî (tîcaret) zimanê yekemîn e. Lê, va tespît nayê wê manayê ku, kurd mecbûr in tenê tirkî hîn bibin û zimanê dayîka xwe bîr bikin. Pêwîst e ku zarok, keç û xortên me di dibistanan da û li cem cîran û hevalên xwe yên tirk bi tirkîyêk paqij û bê aksent xeber bidin. Kîjan zimanê bîyanî bibe bila bibe, divê kurd wî ziman baş bizanin û biaxifin. Zanebûna zimanên din rolek pozîtîf ne tenê di jîyana şexsî û kar da, ji bo zanabûna zimanê dayikê jî dilîhîze. Bona vî, tirkî ji bo kurdên Anatolîyê û kurdên din yên di hindûrî Tirkîyê da dijîn girîng e. Ewqas jî, zimanê kurdî divê ji bo me girîng be û pêş keve.

**Kurdên Anatolîyê çawa zimanê**

dayîka xwe bîr nekin û pêşva bin? Ew wezîfeya kê ye û bi kîjan xebat û metodan bigehîje hemû kurdên Anatolîyê?

Ev pirs divê bèn lêkolîn û nîqaşkirin. Êdî eva problem yan jî babet ji nasnameya kurdî û zanaştîya netewî giringtir e, çima ku kurdên Anatolîyê dizanin ew kurd in û xwe qet tirk nahesibinin. Lê, kurdbûn çî ye û bi kîjan şiklê tê îcra û eşkere kirin? Ev pirs û bersivên evan di mijoyên kurdên Anatolîyê da hîn cîh negirtîyê. Di vir da rola zimanê dayîkê rolek navendî dilihîze û ji alîyê kurdên Anatolîyê gerek bê naskirin û baş famkirin.

Em ê niha werin ser pirsê bîrnekirin û pêşvabirina zimanê kurdî, yan jî zaravayê kurmancî li Anatolîya Navîn. Berê wê divê bê gotin ku, hinek zimanzan û lêkolîner tespît û ditînen xwe pir caran di rûpelên „Bîrnebûn“ê da yan jî di malperan da pêşkêş kirin. Wek nimûne: Alî Çiftçi di salên dawî da di her hejmarê „Bîrnebûn“ê da li ser pirsê zimanê kurdî dîtî û pêşniyarên xwe tîne ziman. Ji bona vî, ev nivîs wek berdewamkirina nivîsên Alî Çiftçi û yên kesên din divê were famkirin.

Bîrnekirin û pêşvabirina kurdî berî her tiştî bi destê me ye. Kurdên Anatolîyê divê li mal û derva, li

gund û bajaran bi hev ra kurmancî deng bikin. Ev ne zor e û her dem jî mimkûn e. Ji alîyê din, wezîfeya dê û bavan ew e ku kurmancî bi zarokên xwe bielîmînin. Li mal û şênayîyan divê em kilamên bi zimanê xwe guhdar bikin, gora îmkanên xwe jî hîn bibin. Televîzyonên kurdan wek Roj TV, Kurdistan TV, KurdSat û yên din ji bo hînbûna ziman îmkanên mezin pêk hanîne. Lewra, di nav Kurdên Anatolîyê da bibe „edet“ ku, li mal televîzyonên kurdî temaşa û guhdar bikin. Bi vî awayî him kurdî tê parastin, him jî gotinên (peyvên) kurdî yên nû ê bèn zanîn.

Mixabin, di nav Kurdên Anatolîyê da mereqa kurmancî roj bi roj kêr dibe. Ne tenê li bajaran, li gundan jî tirkî êdî bûye „mode“. Ev jî, xweasimîlasyonêk giran bi xwe ra tîne, ku nasnameya kurdî vala di-be û bi rizîkoyên mezin ji alîyê ziman, çand û jiyan girêdayî ye. Ji bona vî divê wezîfeya me ya herî mezin parastina kurdî be. Grubek piçûk yên Kurdên Anatolîyê ev barê giran, ji çend salan vir da dayîne ser milê xwe. Wek nimûne, kovarên „Bîrnebûn“ û „Veger“ yek jî evan e. Ji alîyê din hinek kes, yan di kovaran da yan jî di malperan da, nivîs û lêkolînên xwe bi zimanê zikmakî, yanî bi kurdi pêk tînin.



Dengbêj, hozan û grubên mûzîkê wek Serbulent Kanat, Koma Xelikan, Nurettîn Çiçek û Cejno di vî warê da xizmetên mezin kirin û hîn jî dikin. Malperên wek “Xelikan”, “Malpera Kurdên Anatolîyê”, “Malpera Kurdên Kirşehîrê” hwd. nimûneyên ji bo îstifadekirina îmkanên înternetê ne.

Lê, Kurdên Anatolîyê çiqas bala xwe didin van xebat û hewildanan? Çend kurdên me van nivîsan dixwînin û guhdariya stran û klamên kurdî dikin? Bersîva van pirsan bêşik eşkere ye: Kurdên Anatolîyê bi pirranîya xwe bê xeber û enterese ya berhemên ziman, mûzîk û çand dijîn. Kovarek wek “Bîrnebûn”, mixabin, ne tenê li Ewropayê tê weşandin, ew li vir jî tenê tê xwendin. Pirtûkên bi zimanê kurdî, di jiyana û rojê Kurdên Anatolîyê da qet rolekê nalîzin. Ev tişt, ji bo akademîsyên û “ronakbirên” me jî rastîyek e.

Sedemên bîrkirin û dûrmayîna ji ziman û çanda kurdî ne tenê, sîyaseta qedexekirin û asîmîlasyona ji aliyê dewleta Tirkîyê ye. Sedemek jî, Kurdên Anatolîyê bi xwe ne. Di nav ewan da jî sûcê “xwende” û sîyasetmedarên, ku bi pirranî xwe “welatparêz” dihesibînin, gelek mezin e.

Yek nimûne; hevalên me yên demekê di tevgera kurd da cîh girtî bûn û di wextê da xebatên giring kirî bûn, îro bi “nasnameya xwe a kurdî” êdî ji aliyê ziman û çand tam bûne tirk. Ruh û mîjroyî kurdî li cem ewan nemaye, ku di mal û gundên xwe da jî bi tirkî deng dikin. Ev him şerm û şaşîyek mezin e û him jî nimûneyek xelet e ji bo gundî û malbatên Kurdên Anatolîyê.

Kesên berê 25-30 salan li gund û bajarên Anatolîyê bi navê “DD-KD” û “Özgürlük Yolu” di nav gel da xebatên welatparêzî dikirin, îro bûne “tirkên” Kurdên Anatolîyê. Ji aliyê din hevalên ku di dema nû da bi navê “DEHAP” yan jî “DTP” xebata sîyasî dikin, di nav gel da tirkî deng dikin.

Rexne û daxwazên, ku ji aliyê akademîsyen û sîyasetmedarên Kurdên Anatolîyê bînin ziman, pîr in. Wan kesan ciddîyet û giringîya zimanê zikmakî ji nasnameya kurdî û mafên kurdan fam nekirine. “Welatparêzî”ya wan di gotinan da dimînin, çima ku naxwazin pirs-girêka ziman ji xwe ra bikin wezîfe û babeta xebatê. Ji bona vî, em çiqas loman ji wan kesan bikin di cîh da ye.

# ŞAR Û KITAN

Mem Xelikan

Kinc û libas; perçeyek ji çand û kultura gel û netewa ne. Her netewayek kincên xwe yên folklorîk hene. Şar û kitan jî; aksesûarên kincên jina ne, kincên jinên kurd. Herdu aksesûar jî cih û rolekî wan yê mezin hene. Lê di kultura kurdan de, manayên mezin tînin ziman, îfade dikin. Şar û kitanê, van herdu aksesûaran jî jinên kurdan li serê xwe girê didin. Her yek ji wana nîşanek e. Şar jî û kitan jî di kilamên me yên şinan de, di stiranên me yên dilan de cihekî mezin girtine. Ji ber ku ew aksesûarên jinên kurdan e û wê nîşanê tînin ziman. Min ji bo we bi pîreke Xelikan re heypeyvînek çêkir, bi **Eşa Erew** re. Pirsên min û bersîvên Eşa Erew li jêr in.

*Etê, şar çi ye, kitan çi ye?*

– Hûn jî dizanin, şar jî kitan jî ji perçeyên kincên jinan in Kitan, jin pê porê xwe vedişêrin. Şarê jî li ser kitanê girêdidin û didin ber enîya xwe. Herduyan jî, jin pê serê xwe dixemlînin.

*Şar û kitan; we bi xwe didirût?*

*We ji çi çêdikirin?*

– Şar ji Helewê dihatin (Sûrîyê–M.X.). Me, ew rişî dikirin û toqaz pê va dikirin. Kitan, me ji keten bi xwe didirût. Kitan perçeyek paçî spî ye. Her çar kêlekên xwe yek in.

*Te got, jin didin serê xwe. Çima, keçik û bûk nadin serê xwe?*

– Na, şar û kitan, her yek nîşan û sembolek e. Kitanê, jin tenê ê bi serê xwe din. Keçik, hetanî bibine bûk; ew şarpe û kefiyê li serê xwe girêdidin. Kitanê girênadin. Ew sembola wendakirina bekarêtiyê ye (keçinî, qîzinî). Li Qirpînarê, Eş Mavî hewû. Keçeke wê ya bi dergîstî miriwû. Li ser kilam gotiwûn. Digot;

*"Li lîvanê Zêwo li lîvanê*

*Hewêsa dilê min de mayî*

*Min Zêwik nedî bi şar û kitanê"*



Eşa Erew,  
di baxçê xwe de

Manaya wê, min Zêwik nekire bûk, neda ber tu malan. Zêwik mir, keçik wû. Ne kitan, ne kefi li sêri wû. Wê tîne ziman.

*Erê, di kilameke dila da jî ew heyê.*  
*Dibê;*

*“Dameweste li ser soka nê,  
min nas nekir bi kitanê”*

– Na, bi xortanî, dilê xwe ketiwû wê keçikê. Bi keçikî, şarpe û kefi li sêri wû. Bû bûk, çû mêrekî xwe kir, kitan da serê xwe. Dibê “Ez, te bi keçikî, bi şarpê nas dikim.” Bi vê simbolê, di kultura civata me da manaya kitanê tîne ziman.

*Ji min re behsa şarê bike.*

– Şar, min berê jî got, jin li ber enîya xwe girêdidin. Şarê; keçik, bûk û jin giştik didin serê xwe. Lê keçik şarê li ser şarpê girêna-

– din. Bê şarpe, bê kitan porê wan li der, li ber enîya xwe girêdidin.

*Di kultura me de, şar jî sembolek e.*  
*Di filmê Mem û Zînê de, jinek derdikeve şara xwe davêje ber lingên mêran. Manaya wê çi ye?*

– Erê, emê bênî „Şarpa mine reş li ber lingên te we.“ Ji bona navbera mêran de şer – hing mezin newe, tu nerindî çenebin, jin ê şara serê xwe bavên ber wana. Manaya wê; ar û namûsa min li ber lingê te we. Di kultura me da, dixwaze mêt ar û namûsa me nedin bin lingên xwe. Ji bo wê jî jinekê li tiştêkî weng şara xwe avêt, ewana jî dest ji şer berdidin. Kê ew ne anî şûnê, di civata me de bi çavekî rind li vî mênakin û di civata me de şûna wî nawe.



Eşa Erew

*Li herdê me, doralîyên me qe tişteki weng bû? Qe te bihîst jinekê li vir jî şara xwe avête ber hena?*

– Erê, li şerê Mala Mehtopolê, (*Şerê pismaman*–*Bîrnebûn*: 9), wexta kurikên Satîyê hatin dergîsta Hesên birevînin, Kewa Hesî Kalê şara xwe avêtiwû ber lingên wana. Lê di-



Keç, bûk û jin bi xemilên xwe

gotin wana şara Kewê, dayine ber lingên xwe û çûyine. Zêwa dayika min digot „Ez û Memê min, çûnî hewşoyan kix berhev kin”. Tu dizanî, hewşoyên me nêzikî Qozanliyê ne (gundê tirka ye. M.X.). Meriyekî Qozanliyê, bi Memê ve hing kirine. Zêwê, kitana xwe avêtiye ber lingên wî û gotiyê “Mem î min telayekî bi tenê ye, şer dawestînin.” Bi ser wê de, mêrik Mem berdaye û çûye.



Keç û bûkek xelîkî

*Qozanliyê tirk in, ew kultura li cem wana jî heye?*

– Na na, vî mêrikî dayîka xwe î kurd wûye. Dayîka wî, bi ber wî xistiwûye. An jî, em bi tirkan ve tev dijîninî. Dibe ku, tirkan ew erf û edeta ji me girtibin.

*Yek jî li herdê me dibên “Şara min li serê te be”. Manaya wê çi ye?*

– Ew, wek nifrekê ye. Jineka ji dest hena (mêr an jî jin) aciz be, an



Bûk bi kitanê



Bûk bi şar û kitanê

jî dexwazîyeke wê neanîne şûnê, bersivê nedine dexwazîya wê, ew ê bê “Şara minê reş li serê te be.” Manaya wê; tu jî mina min pêrişan û belengaz bî, tu jî di halê min kevî.

*Di stiraneke me de, “çima şara serê te xelîya yê” derbas dibe. Şara serî xelîyan çi ye?*

– Jinek ku mêrê wê mir, jê re dibêjin şara sêrî xelîya. Mêr, dîrega malan e. Jinek bê mêr ma, ew ê ji dest û pîyan de bikeve. Stûxwar be. Şar, aksesûara xemila wê ye. Şara sêrî xelîyan, halê ew têde îfade dike.

*Ji te re spas û hurmet. Te bi min re, sohbeteke pir xwaş kir.*

– Ez jî ji te û hevalên te re emrekî dirêj dixazim.



Keç bi şarê, bûk bi şar û kitanê



Keç, bûk û jin heryek bi xemilên xwe





# BÊŞQAWAXA MEZIN

## BÜYÜKBEŞKAVAK

Necati Kanoğlu

Gor hin gotin û texmînan (Mixabin lê qet çavkanîk an jî wereqek dest kesî da tune.) Bêşqawaxa Mezin dawîya sedsala 19an da hatîye avakirin. Tê gotin ku eşîra Têrikan û eşîra sewêdî gund ava kirine. Demekî şunda ji navçeya Erzirome, Narmanê 6-7 malên kurd hatine li gund bi cîh bûne. Xelkê gund van malana ra gotine eşîra nermalî. Lê heta nuha eşîrek bi vî navî qet di çavkanîyekî de derbas nebûye. Bawer dibe ku, gundiyan jî bo ku ew ji Narmanê hatine, bi vî navî nav kirine. Dev devî dawîya sedsala 19an û destpêka şerrê cîhanê î yekemîn da hinek mal û eşîrên din jî hatine li wir bi cîh bûne. Gundê

cîran li derdora Bêşqawaxa Mezin ev in: Bêşqawaxa Biçûk, (Hinek gundîyên xwe ji Bêşqawaxa Mezin çûne.) Kelhesen, Qendîl, Yayla Çolê (Hetanî sala 1954 yayle a Bêşqawaxa Mezin bû. Lê ji vê salê şunda bû gundekî serbixwe.) û Yeşildere ne. Yeşildere jî hetanî sala 1989an yayle a Bêşqawaxa Mezin bû û bi navê Yayla Çîmanê dihat naskirin, lê ew jî ji wê salê şunda bû gundekî serbixwe. Yayle a Bêşqawaxa Mezin ku bi navê kîllikê tê naskirin nebûye gund û wek taxek gund maye. Bêşqawaxa Mezin hundirê 100 salî da xwe li 5 navçeyên Konyayê girêdayî. Ew navçana; Sille, Kadınhanı,

Hatırlı, Böğrüdilik û Cihanbeyli ne. Bêşqawaxa Mezin nuha girêdayîye Cihanbeyliyê ye. Bêşqawaxa Mezin 50 km ji Cihanbeyliyê, 150 km ji Konyayê û 130 km ji Enqerê dîr e. Bêşqawaxa Mezin di sala 1992an da bûye şaredarî. pîranîya xelkê gund ku debara xwe bi cotkarîye dike. Keda karkerên ku li derveyî welêt dixebitin jî di debara xelkê gund da cîheki girîng digre. Nêzikî 200 Malî gund li welatên Ewrûpayê (Almanya, Danîmerq, Swîsre, Swêd, Norwêç û Ostrîs) dijîn. Qasî 50 malî jî bo sedemên kar û bo sedemên perwerdeyî li Konyayê dijîn. Hejmartina gel a dawî da li gund 2184 kes hatine jimartin.

Rivayetler, tahmin ve bazı durumlar, (Mezarlık, konut v.s.) Büyükbeşkavak köyünün 19. yüzyılın son çeyreğinde kurulduğunu (Yazılı bir belge, kaynak maalesef yok.) gösteriyor. Köyün Têrikan ile Sewêdi aşiretine mensup haneler tarafından kurulduğu söylenmektedir. Daha sonraları köye Erzurum'un Narman ilçesinden gelen ve köy halki tarafından Nermalîya diye adlandırılan 6-7 aile yerleşmiştir. 20. yüzyılın başlarında ve I. Dünya savaşı döneminde köye yerleşen farklı aşiretlere mensup haneler olmuştur. Büyükbeşkavak köyüne komşu olan köyler: Küçükbeşkavak (Ahalisinin bir kısmı

Büyükbeşkavak'tan gitmedir), Kelhasan, Kandil, Çölköy (Büyükbeşkavak köyünün yaylası iken 1954 yılında köy statüsüne kavuşmuştur) ve Yeşildere'dir. Yeşildere köyü de keza Büyükbeşkavak köyünün Yayla Çimanê olarak bilinen yaylası iken 1989 yılında köy statüsüne kavuşmuştur. Büyükbeşkavak'ın köy statüsüne kavuşmayan sadece killik yaylası kalmıştır. Büyükbeşkavak yaklaşık 100 yıllık bir zaman dilimi zarfında sırasıyla Sille, Kadınhanı, Hatırlı, Böğrüdilik ve Cihanbeyli olmak üzere 5 ilçeye bağlanmıştır. Büyükbeşkavak köyü halen Konya'nın Cihanbeyli ilçesine bağlı olup; Cihanbeyli'ye 50 km, Konya'ya 150 km ve Ankaraya da 130 km uzaklıktadır. Büyükbeşkavak köyü 1992 yılında belediye statüsü kazanmıştır. Köy halkinin en önemli geçim kaynağı tarım gelirleridir. Bunun yanısıra yurtdışında çalışan işçilerin gönderileri de bir kısım köy halkinin geciminde önemli yer tutmaktadır. Köy halkından yaklaşık 200 kadar ailenin yurtdışında (Almanya, Danimarka, İsviçre, İsveç, Norveç ve Avusturya) ikamet ettiği sanılmaktadır. Köy halkından 50 kadar hane de çocuklarının eğitim-öğretimi ve mesleki durumlarının gereği Konya merkezde ikamet etmektedir. Son nüfus sayımında köyde ikamet etmekte olan nüfus 2184 olarak tesbit edilmiştir.

# EŞÎR Û MALËN BÊŞQAWAXA MEZIN

## BÜYÜKBEŞKAVAK`TA YERLEŞİK AŞİRET VE HANELER

### 1 EŞÎRA TÊRIKAN – TÊRIKAN AŞİRETİ

Eşîra Têrikan gor gotinên mezinan û gor hin çavkaniyan di salên 1850an da ji Amed`ê hatine. Destpêka koçberîyê da li gundê Polathisarê li navçeya Sivrihisarê ku giredayîyê bajarê Eskişehirê ye, bi şûn bûne. Deme kî şunda tevê serîhildanekî bûne û ji bo vê yekê jî ji Sivrihisarê jî koçber bûne û hatine li dorberê Haymanayê di sala 1859an da gundên bi navên Çatak, Tepeköy, Cihanşah, Boğazkaya û Sırçasarayê ava kirine û li wan gundana bi şûn bûne. Hinek malên Têrikî jî demekî şunda li gundên Kelhesen, Bêşqawaxa Mezin, Bêşqawaxa Biçûk û li Yayla Çolê bi cih bûne.

Yaşlıların anlatımı ve eldeki sınırlı yazılı belgelere göre Têrikan aşireti 1850 li yıllarda Diyarbakır`dan göç ederek önce Eskişehir`in Sivrihisar ilçesine bağlı Polathisar köyüne yerleşirler ancak kısa bir süre sonra bir isyana karışır ve oradan da göç etmek zorunda kalırlar. Aşiret 1859 yılında Haymana`ya gelerek Çatak, Tepeköy, Cihanşah, Boğazkaya, Sırçasaray köylerini kurarak yerleşir. Bir kısım Têrikan aşireti mensubu hane de Büyükbeşkavak, Kelhasan, Küçükbeşkavak`a (daha sonraları Çölköy) yerleşir.

#### MAL – HANE

#### PAŞNAV – SOYADI

Mala Qaso	Kanoğlu, Pekmezci
Mala Siloyê Xecê	Ceran
Mala Kor Simo	Dal, Seçilmiş, Demir, Özkan
Mala Besikê	Can, Çam
Mala Satê	Can
Mala Enwerê Betê	Yıldız
Mala Gulikê	Demir
Mala Osikê Hesên	Akdemir
Mala Ehmedê Weyso	Bilen



Bêşqawaxa Mezin

## 2 EŞÎRA SEWÊDÎ – SEWÊDÎ AŞİRETİ

Eşîra Sewêdî ji navçeya Siverekê hatiye û li Aksarayê bi cîh bûye. Demekî şunda mal bi mal hatine li Beşqawaxa Mezin û li gunden doralîyê (Qendil, Çîman, Yayla Mewlut, Beşqawaxa Biçûk, Qonax û li Yayla Çolê) bi cîh bûne. Endamên eşîra Sewêdî ên ku li gunden Cihanbeyliyê bi cîh bûne, hîn jî tekîlîyên xwe bi merîyên xwe ên ku li Aksarayê dijîn re berde-wam dikin.

Sewêdî Aşireti Siverek ilçesinden göç ederek Aksaray'a yerleşir. Bir süre sonra Aşirete mensup bazı aileler Cihanbeyli'nin Büyükbeşkavak, Küçükbeşkavak, Çimen, Kandil, Konak, Yeşildere ve Çöl Yaylasına yerleşirler. Cihanbeyli`de yerleşik olan Sewêdî aşireti üyelerinin Aksaray`daki akrabaları ile ilişkileri hala devam etmektedir.

**MAL – HANE****PAŞNAV – SOYADI**

Mala Kahê	Başaran, Deveci, Kurdoğlu
Mala Husê	Erman
Mala Cahniyê	Unlü
Mala Gurreşê	İnal
Mala Hemê Şarê	Şekerci, Öz
Mala İwikê	Tahtacı, Takipci
Mala Eysikê	Duran
Mala Zibdiyê	Uzun
Mala Dirso	Akkuş, Koyuncu
Mala Hesikê	Yağci
Mala Hecismêl	Şener
Mala Hemzo	Keser
Mala Nazikê	Arslan
Mala Qîmo	Parlak
Mala Hesê Hecî	Koyuncu
Mala Hemê Yano	Çoban
Mala Lîlê	Karakaş
Mala Millhusikê	Çöl
Mala Xello	Altıpınar

**3 EŞİRA NERMALÎ – NERMALÎ AŞİRETİ**

Eşîra Nermalî ji navçeyan Narmanê a ku giredayîye bajarê Erziromê ye hatiye. Bi rasti eşîrek bi vî navî heta nuha qet li çavkanîyekî nehatîye dîtîn. Ez bawer im, ew ji bo ku ji Narmanê hatine, eşîrek berê li gund bi cîh bûne ew nîv kurdî nîv tirkî „Nermalî“ bi nav kirine. Ez dîsa bawer im ku di pêşerojê da lêkolînên bi rûmet ê pêk werin û ê derkevin holê ku bi rastî ew endamên kîjan eşîrê ne.

Nermalî aşireti Erzurum`a bağı Narman ilçesinden gelerek Büyükbeşkavak köyüne, sonradan bir kısmı Çöl Yaylasına yerleşmiştir. Bu güne kadar böyle bir aşiret adına hiç bir kaynakta rastlanmadım. Kanımca köye daha önce yerleşmiş olan aşiretler, bunları salt Narman`dan geldikleri için kürtçe-türkçe karışık, Nermalî diye adlandırmışlardır. Umuyorum ki bu konuda ilerdeki süreçte araştırmalar yapılır ve böylece de aşiretin gerçek adı ortaya çıkmış olur.

**MAL – HANE****PAŞNAV – SOYADI**

Mala Ali	Kaymak
Mala Hesqirnî	Kara
Mala Hesê Beqir	Taşan
Mala Killê	Akkoyun
Mala Lollo	Büyüksari
Mala Millomer	Ocal



## EŞİRA QEREFEQÎ

### MAL – HANE

Mala Osmîn

### PAŞNAV – SOYADI

Çetin

## 4 EŞİRA PİSÎYAN – PİSÎYAN AŞİRETİ

Eşîra Pisîyan piranîya xwe li gundên bajarê Kırşehirê dijîn. Van herdu malên ku li Bêşqawaxa Mezin bi cîh bûne, bi gor bawerîya hin kesan, dema şerrê cîhanê î yekemîn da hatine. Tê gotin ku van malan bi merîyên xwe ên ku li Kırşehirê dijîn ra têkîlî çêkirine.

Büyükbeşkavak köyünde yerleşik olan bu iki aile I. Dünya savaşının devam ettiği yıllarda Kırşehir ilinden gelmişlerdir. Son zamanlarda Kırşehir`deki akrabalarıyla tekrar ilişki kurmuşlardır.

### MAL – HANE

Mala Huspîşî

Mala Mehmedê Pisî

### PAŞNAV – SOYADI

Demiraslan, Çetin

Demirtaş

## 5 MALÊN KU EŞİRÊ XWE NAYÊN ZANÎN – AŞİRETİ BİLİNMEYEN HANELER

### MAL – HANE

Mala Memedalî Serê sedsala 20. da ji bajarê Rihayê, navçeya Xalfetiye hatine û bi şûn bûne.  
20. Yüzyıl başlarında Urfa`nin Halfeti ilçesinden gelip yerleşmişlerdir.

Mala Tahîr Salên Şerrê Cîhanê î yekemîn da ji Wanê hatine û bi şûn bûne.  
I. Dünya savaşı yıllarında Van`dan gelip yerleşmişlerdir.

Mala Zekî Salên Şerrê Cîhanê î yekemîn da ji Erziromê hatine û bi şûn bûne.  
I. Dünya savaşı yıllarında Erzurum`dan gelip yerleşmişlerdir.

Mala Hemzekê Qaşî ku tîye zanîn ew jî ji Aksarayê hatine.  
Bilindiği kadarıyla Aksaray`dan gelip Büyükbeşkavak`a yerleşmişlerdir.

Mala Husoyê Ehmedê Elikê ji gundê Qendîlê hatine û bi cîh bûne.  
Kandil köyünden gelip yerleşmişlerdir.

### PAŞNAV – SOYADI

Çetinkaya

Bayar

Durmaz

Anlı

Çakmak

**Têbinîyeka girîng/Önemli bir not:**

Ev hejmarên malan ku li jor hatine nivisandin hejmarê dema avabûna gund in. Nuha meriv dikare bêje hejmaran malên Bêşqawaxa Mezin li 500 î zêdetire.

Haneler sayılırken köyün kurulduğu yıllar, daha doğrusu 20. yüzyılın başları dikkate alınmıştır. Şu anki hane sayısının 500 dolaylarında olduğu tahmin edilmektedir.



## Gundê Qemera

### Resul Altuntaş

Gundê Qemera 16 km ji Cîhabeyliyê dûr e. Çar mezrayên (yaylayên) xwe hene:

1. Hatsan
2. Garimqe (ilica)
3. Golê (gol)
4. Olaqir (Alakir)

Li gor hijmartina giştiya sala 2000an nifûsa gund 2.232 e.

Ji sala 1986an ve li gund dibistanek heye û ev dibistan ji aliyê Cihat Kora hatiye çêkirin. Şagirdên ku li gund dibistana seretayî (ilkoğretim) diqedînin diçin li Cîhanbeyliyê li-seyê dixwînin.

Di sala 2000 an de li gund şaredarî (belediye) hat damezrandin

û serokê şaredariyê yê niha ji Partiya AKPê ye.

Li gundê Qemera niha kursên neqş û dirûnê hene û keçên ciwan diçin kursan. Mizgefta (camîya) gund di sala 1981ê de hatiye çêkirin.

Li mezra Hatsan ziyaretek heye û gundên û derdor diçin li wir dueyan dikin û daxwazên xwe dibêjin.

Debara gundiyan bi giranî li ser zireetê ye lê heywanan jî xwedî dikin. Li nêzikî gund cî û kana qûmê heye bi navê Alkan şirketek ji wir qûmê derdixe û gelek însan li wir kar dikin. Gundiyên me wek meslek şoferîyê jî dikin. Wek gundên derûdorê ji gundê me jî gelek kes derke-



tine der û li Ewropa dijîn. Ji wan hin-  
nek kes beşek ji sermayê xwe tînin  
gund, li gund xanê çêdikin, li wir  
mesref dikin, ciyên kar vedikin.

Li gund sê eşîret hene. Du yên me-  
zin Xelikan û Îzolî ne. Li gor gotinan  
ev mezinên gund di salên 1570an de  
ji herêmên wek Dîlok(Adiyaman),  
Meletyayê û Dîyarbekirê hatine û  
gund ava kirine.

Gundiyên me li her derê Ewro-  
pa belav bûne lê piraniya wan li  
Almanya, Avusturya û li Holandê  
ne. Ew gundiyên me yên li Ewro-  
pa heta niha, wek kepçe, ambûlans  
û agirkuj(îtfaiye) alîkariya gund û  
şaredariya gund kirine û dikin.

Gundiyên me hemû kurd in û bi  
kurdî deng dikin. Di van salên dawî de  
ji gund gelek ciwan li zanîngehan (unî-  
versîteyan) dixwînin.

Li nêzîkî gundê me kanaleke avê  
ya dîrokî heye ku ji serdema Hîtîtan  
ve maye. Kesekî lê nenêriye û bêx-  
wedî maye loma îro qîmeteke wê ya  
turîstîk û dîrokî nemaye. Xerabe ye.  
Li Qerecadaxê jî çend ciyên dîrokî  
hene û tê gotin ku ji dema Asûriyan  
mane. Ew jî îro xerabe ne.



## Xelata kurteçîrokan

Bi însîyatîfa Kovara Bîrnebûnê û bi piştgirîya Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almaniyayê wek ku xwendvanên me jî pê dizanin me di sala 2006an de pêşbirkeke kurteçîrokan li dar xistibû. Ji bo vê pêşbirkê ji me re hinek berhem hatin û juriya me ji nava wan kurteçîrokan çar berhem hêjayî xelatê dîtîn.

Xelata yekemîn: **Zêbik** / Bekir Darî

Xelata duwemîn: **Fedekarî** / Mem Xelikan

Xelata sêyemîn: a) **Sepana Qîto** / Abdulhalik Duran

Xelata sêyemîn: b) **Pêketin** / Berzan Çelebî

Motîvasyon: Bi gotin û vegotina xwe a hunerî, bi estetîka xwe a trajîkomîk **Zêbika Bekir Darî**,

bi melodramîya navaroka xwe û şeweyê vegotinê, **Fedekariya Mem Xelikan**,

bi asosiyasonên xwe yên şîret, şewir û şiyariyê herdu kurteçîrokên xelata sêyemîn: **Sepana Qîto Abdulhalik Duran**, **Pêketina Berzan Çelebî** bûn xwediyên xelatên îsal.

Xelatên van xelatgiran ê di pîrozbahîya 10 salîya Bîrnebûnê, 29.04.2007an de were dayîn.

Xelata yekemîn:



## ZÊBIK

Bekir Dari

Kitana xwe dûz kir û destê xwe li ser rûyen xwe çerx kirin bi şun da, got: »Xwedêyî mezin e!«

Mîna ku gumana min bi gotinên xwê wune, li min nerîya.

»Mêzeke li doraliyê me weqes kes hene, di nav wan da«, destê xwe dirêjî jinên ku gîyayî şjingga beref dikin kir. »Ê di ser min ra jî hene ê di bin min ra jî hene, bi emrê wî şukur!«

Ez û Zêbikê em di bin sîha kulava da li bendê çayê ne. Zêbikê, li hemberî min rûniştîye. Bi ava şiregermî qadaxên çayê dişoye. Ez jî li melamatîkê digêrême ku kalê çayê dirêj kim, ku ma jinên gund tenîke zêde li ba min bisekinin.

Li çolê dîşlikî însanî bi tenê î nê. Ku kî hatiye ba min ez î pê razî me. Ji ku hişê min gehîştine, ez î li çolê û li ber pêz im. Çavê min li ser rêya gund, li deriyê insanên gund e. Ji dewdewî biharê da ê biqor, biqor bikşin warin, li gaz û banîya, di nav erg û zavîyan da parîyê mîyê, qûske bejî, xerdel, çitlix, pirpar, û gîyayên din beref kin ku ji kulfetî xwe re xwarinê çêkin. Li



dawîya biharê dora Qanqel, kareng û gizera ye. Li havînê tiştên xwerinê î kê m in. Ji silmastikê bêtir tişt namîne. Jin ê dest bi gîyayî şijinga bikin, ji golika ra gokbaş, sirîyê çavkesk, nankusî beref kin. Havîn ji wan re pir bi zahmet e, di bin kelekela germa havînê de ewan ê kuşkûr û kixî pêz beref kin û bi seklem seklem mîna mêriya bi dû hev din û bikşînin mal.

Havîn ku ji wan ra çiqes bi zahmet e, ji min ra jî weqes bi keyf e. Yekcaran keyfa min î weqes xweş dibe ku ezî dizûrime mîna gura. Dihersime ku boça min tune ku ez mîna kûçika bang kim.

Zûrînî bi min nakeve, wê hobê baz didime li ser lingên xwe yên paşî, mîna canîya, dibezême wirda-wêda, germa havîna germa tîr, di mûyên min digere û dihêle dibe bihakî meyxos, hişê ji serîyê min dibe. Li rojên weng qet naxwazime ku ma êvar bibe. Ew kesanên li ba min bûn ezî sêwîbûyîna xwe bîr dikime.

Ezî sê salî bûme ku dê û bavê min bi ber leh da çûyîne. Wexte-ku dê û bavê min zawicîn qelingê wan mangeka belek û pênc kavir bûne. Ji şîrî dayka min zedetir şîrê wê mangê î di zikê min da ye.

Baraneka afet dibariye. Ji baranê bi şun de leh tê û manga belek bi xwe re kaş dike. Dayka min "Xwedê rehmeta xwê lêke", dibîne ku leh manga belek diba. Ew bi lez dikeve dû mangê û bi boça mangê digirê ku mangê xilas ke. Leh wê jî kaş dike ber bi Özêmalêşotê. Manga belek û boçika wê di destê dayka min de û dayka min di nav ava leh da lûl dibin û têne qiraxê malê me. Bavkê min "Wê wextê bi min dilîstîye ku min di xewê ke", wan dibîne û xofek dikeve bedena wî, min çeng dike ser sedirê "ji wê wextê da pozê min î bi axzê çepê da xwar e. Bi çi hirsê ez çeng kirime! Ezî li duwêr ketime û devrûyê min di bin xwînê da mane û ezî ji xwe va çûme", dibîne ku lehka şen, di nav leh da manga belek û boça wê di destê dayka min da, di nav avê de lûl dibine. Bavkê min, "Xwedê rehmeta xwe lêke", xwe li avê dixê ku wan xelas ke.



Bi destê dayka min digire ku bikşîne bi derxe ji nav avê, dike qîrrînî:

"Basê, boça mangê berde ku ez te xelas kim! Ku çûyê ma manga belek bi leh de here."

Dayka min boça mangê bernade, ji wê mangê betir tu tiştên wan tune. Bavkê min dîsa dike qîrrînî; "Lêlê, kur bûyê çima tu boça mangê bernadî?" Bavkê min bi telaşê û şematê dixwaze ku wan xelas ke. Ezîgekî ku leh bi xwe ra kaş dike tê li pişt bavkê min dikeve û wî jî lûl dikê nav ava qilêrî. Manga belek û boça wê di destê dayka min da, destê dayka min di destê bavkê min da, yekcaran di binî avê yekcaran li ser avê kaş dibin hetanî binî gund. Li binî gund leh bedena wan bêruh, li koka dareka gûzê li cih tîle.

Ku ez mazin bûm bi şuva, qala wan dikirin. Ew hersêna, hûrên wan tijî av, destê wan di destê hevda û destê dayka min da boça manga belek li koka dara guzê piçikî û devrûyên wan di bin mîl û çehmûrê da dirêj bûne û derîya gorên xwe çavdikirine. Ezî nuha dehûheşt salî me, yekcaran hevalên min ku bahsê dê û bavên xwê dikin issizîyêk dikeve serdilî min.

Nuha li kêleka wî arî, li hemberî Zêbikê dilê min dixwaze ku daykeka min jî hebûya. Destê xwe di nav porî min ra çerx kira,

ji min bipirsîya "dilê te çi dixwaze" an jî bigota, "tuî birçî yî? Ji te ra du hêkan bişkînim tu ê bixwî!" Zêbikê, mîna ku ew tiştên di ber dilî min ra radibirin fahm kirîye û dixwaze ku min tes-selî ke.

Destê xwe avête milê min. Got. »Ji ku ew mirîye pêva ez û kulfetê xwe î rahat in, wî bi min pir ezîyet kir. Ew ê di mezeli xwe de daweste Înşalleh! Hetanî ku ez çûme herdê wî, ew ê bi nalenal ke, binale û bizure, mîna kûçikê qenere boç di navberê lingê wî da ê biewite«.

Bi hêrs û şematekê rabû ser pê, pêşa xwe çirpand bi lez çû hat, çû hat, diranê wê dikirin qîrçinî, ez tirsîyam û min nizanî ku ez bême çi, an jî çi bikim. Solixekê bi şun da, dawestî, destê xwe kirine kelekên xwe û bang kir.

»Lêê, lêê zaqûm wexwarino! De werin çay kalî«.

Mîna ku qet tişt nebûye çerxî min bû, û got;

»Bengzê te çima qetî? Min tu tirsandî? Wee qurban, li qisûrê min mezî meke, her ku ew qadnabîya hate bîra min ez î weng gêj dibime, nizanime ku çir dikime«.

Dîsa hat li hemperî min li ser kulêv rûnişt. Bi qîrşekî erd kola, qîrş sê çar caran bi hêrs kuta kortekê bi şun da qîrşê wê şikeşt û rûye xwe çerxî min kir. Gapa wê ya rastê kortek hebû yan şûna kulleka kevn an jî şûna şawatê. Zanî ku ezî li wê kortê mêzî dikime, destê xwe bir ser kulê û bi tiliya xwe li kêlekên kulê daîrek çerx kir û got » ezî bi ser sobê da gêr bûme«.

Zanîya ku min fahm nekir û ezî melûl, melûl li şûna kulê dînerime, sebaba kulê ji min ra got.

"Di ser zewaca me ra şeş meh derbas bûbûn, ezê di keçkê min Gulê da bi ducanî bûm, li serma çile min ardû tavête sobê ku şîva êvarê bikelînim. Xwedêyî, di ser me ra ye, qed ji bîr min nare, ku min ardû avête sobê bi şun da, li ber pencerê rûniştibûm û min kumbil sipî dikirin, zatî wekîdi tiştê ku bikelînim jî tunêbû. Erê, dev devî êvarê, li hemberî malê me li ser zinarê malê şotê,



şivanê malê şotê, bi kurika va tevhev pez yêm dikirin. Di wê navberê da kapîyê me yê der vebû. Min kumbil hîştin, rabûm ku binerim hela kê ye, hîn kêr î di destê min da ye. Hîn ku ez nagehiştimê kapîyê odê jî vebû. Êw kete odê«. Zêbik jî mîna jinên gund gîşka navî mêrkî xwe nabêje, bi mêrkî xwe ra dibêjê, Êw, Wa, Î din, Kûnreş wd. Ez, bervê çûm ku sakoyî wî helînim û bi dar xim. Li herdê sobê min destê xwe dirêjî sako kir, jî nişkava bi mistê li gepira min xist. Ode, di dor min ra çerx bû, ber çavê min reş bûn û ez ji bîr va çûm."

Mîna ku ew mista vê seatê li gepira wê ketîye, weng mahçûp û fedî bi ber xwe da mes kir. Alafê bin çaydên şewqa xwe avête sarçavê wê, sûretê wê sor bû. Mîna ku ji şewqê agir çîkek firîya çavê wê û çavê wê biriqîn, sûretê wê kenîya mîna kulîlkên berfê diranê wê xwe avêtin çolê û çol banî gîşt bi wê ra gewr-gewr kenîyan.

Bi kenî Zêbikê ra mîna ku kevirê êş ji ser qefesa sîngî min rabe. Min solixek... solixeka mîna vê çolê fireh kişand û ez jî kenîyam. Her ku ez kenîyam dinya sivik bû. Ez kenîyam, êşa Zêbikê kê mîna bû. Ez kenîyam, kenîyam, kenîyam.

Mîna ku nû ji xewê rabûye, bi dengê weng qarçimî berde-wam kir.

»Min çavê xwe vekirin, doralîyê min î tijî însan e. Min xwest ku rabim ser xwe ema min bi şiha nekir, fêra min tunebû ku xwe bilivînim. Wexta ku ji ên hatî ra bêjim, "hûn bi xêr hatin", ez çûme ferqê ku kevçî di navbera diranê min da ye. Ez ji bîr va çûm şun da ew kevçîya kirine devî min ku ez solixê helînim û nefetisim. Lê sizîyekê di sûretê min da ye î ku ruhî min bikşîne, min destê xwe dirêjî sûretê xwe kir ku bizanim ew çi êş e. Paç hate ber destê min.

Wexta ku ez ji bîr va çûm ezî bi ser sobê da gêr bûme, gepa min qul-qulkî bûye."

Destê xwe bi şûna kulê da nûskand, paşê bi şewqê mist da û li min nerîya, mîna ku sebaba kulê ew e, bi fedî û mahçûp serê xwe xar kir û got; »Ji wê rokê da heta îro ew nîşanek e ji min ra nîşana bêînsanetîyê... Ji wê bi şun da min pir kut xwarin ema ez ê wê ji bîr nakime, cara siftê însanî ji bîr nake.«

Bi ser fîstanî xwe da mes kir. Mîna ku şevaka tarî, li serî gazezê di hembêza zinarekî da, bi dizî şorekê yan jî sirekê di guhê şeytên da beje, bi dengê weqes bi guhnê got;

»Ruyê min î li binî lingên te, tu î li şûna kurikê min î. Wî, keçikîya min jî weng bi zor û zilmê helîna, mîna ku êzingek kuta min, weqes canê min şewitî, ji wê bi şun da min got ma kûçik bi wî îşî da bikin, her ku dikete ba min, min çavê xwe digirtin û li ber Xwedê digerîyam ku ma ew îşî xwa xalas ke û bicehimê hare«.

Mîna ku bîhngênîkî ji hembêza xwe bavê, berbanika xwe bi bîz çirpand û got.

"Tu dizanî ku ji bo çi ew mista li min xistîye," derîya bersiva min çav nekir. »waxte ku şivanê xelkê li derva bûn ji bo çi ez li ber pencerê rûniştîme? Sebeb ew bûye. Ji şivên xulî bûye û sabê vê li min xistîye".

Zêbikê şora xwe xalas kir bi şun da rabû çû herdê jinên din. Ez li kêleka kulêv weng mam, mîna ku ez felc bûbûm. Bedena min dihezîya, qirika min zîya bû, ji navkê min berjêr sizîyêka



meyxoš junîyê min dihezandin. Bi hezaran pirs di serîyê min da çerx dibûn pirsên bêbersiv.

Xortên zewacî behs dikirin digotin, zewac tiştêkî pir rind e, eman ha eman bizewicin. Wexta ku ez guhdarîya sohbetên weng dibûm bi şun de xewa min nedihat. Ez di binî kulêv da destê min di navbera şeqên min da wirda wêda çerx dibûm ha çerx dibûm. Min dixwest ku rokê pêş da bizewicim, ema kî ê keçika xwe bi sewîkî de? Tirsê min ew bû û min nedizanî ku bi kê bidanişim.

Sohbeta Zêbikê va muşkuleta min anî bîra min. Hîn ku min hişê xwe berefî serhev nekirîye, Zêbik çerx bû hat li şûnê xwe î berê rûnişt. Wextekê li şewka agir ser kir bi şun da, got: "Tu çi difikirî? Pozê te direj bûye mîna ewkî culiqên nexwaş." Nezera wê mîna horîkê bê îz û bê giranî li ser min çerx bûn û hatin li wêderê min sekinîyan. Mizûrê wê şîrîn bû, kenekî melamet li ser lêvên wê dawestî û derîya min çav dikir ku em bi hev ra bikeninî.

Min mes kir ku fedîyê tu xêra xwe ji min ra tuneye û min got: "Hevalên min î zewicî, yekcaran bahsa zawacê dikan, ewana zawacê weqes dipesinin ku dilî merî zawacê dixwaze. Ku guhdarîya te bûm bi şuva bîza min ji zawacê hat. Gotinen te gotî û êşa ku te kişandî ez gêj kirim, hişê min çû.", kete navberê û got.

"Kûçik bi hişê te da bikin. Çima hiş ji serî te teriye? Çima tu napirsî? Tiştên weng meriv ji ker-kûçikan nahewûse, merî ê ji dost û mezinên xwe bihewûse".

# FEDAKARÎ

## Mem Xelikan

Meha Adarê, 15-20 xortên gund pişta xwe dayine dukanên ber camîyê(mizgeft) û rûniştine. Gundîyan jî, bi mêr û jinan dor û paş wana civîne ku eskerên salê bi rê kine. Melleyê gund, Quran di dest de due dikir. Waya, erf û edetek wû. Her esker diçûn; gundîyan ew erf û edeta bi cih tînan. Manaya wê, ji wan eskeran kesek li eskeriyê mir an jî şehîd ket; ji bo ew bê Quran û îman nere dina heq bi saxî dueya mirinê dikirin guhên wana. Navê eskeriyê î giran wû. Ji malbata xwe veqetî, dost û hevalan, evîndar û dergîstan dû xwe ve cî bihêlî herî xerîbîyê. Va çûyîna, ji bo herkesekî qar û barekî giran wû. Lê ji bo Memê hê pir bi êş û giran wû.

Dayîka wî, ji gundekî cîran bûyîwû bûk û hatibû gund. Mem anî dinê, du salan dû Xwedêdayîna wî, nexwaş ket û çû ser heqîya xwe. Memê têrî xwe, ew nas jî nekiri wû. Dayîka wî ew him sêwî, him jî bi ûdeke so (sibê) li serê wî bi derd û bela ve cî hişt çû. Mem, rind û xeraw wek her kurikekî gund, lê; bi hezkirina bavê xwe ya bê tarîf mezin bû. Xortekî 17-18 de salî wû. Di gund de bi xortên di salên xwe re hevaltîyeke baş çêkiri wû. Sergovendê daweta, sazband û ji bo hevalan canfeda wû. Ji bo wê hêjayîya wî jî, li gund, mezin û biçûkan, herkesî jê hez dikir.

Wek her xortekî, Mem jî li wan salan dilekî xwe girt. Êdi rindeke wî jî hewû. Li ser wê kilam stiran û xewên xwe yên şeva revandin. Digot;

*Rindê rindê rind rindê ha*

*Ez qurbanê bejna zirav garên bi guva*

*Rindê rindê rind rindê ha*

*Ez heyranê bajna zirav îşlemê bi pêva.*

*Kirîk rinda xwe birevînim kirîk kewa xwe birevînim*

*Kesî'm tune ji min şuva*

Lê tişteki wî nedizanî hewû. Ya ku dilê vî ketê yî, keça metê wû. Meta wî, hê Zexê du mehî bû; bi derdekî bê derman miri wû. Dayîka Memê, Mem û Zex salnîvekê tev û hev mêjandibûn. Malbatê, ew dila bihîstin, nebihîstin ; Zex dane mêr, ji bo tu nerindî çênebin. Zexê jî, mîna Memê hay ji rastîya wana tune wû. Bi ser vî dilî de, Memê derdê xwe girt. Derdê bêçare û bêderman; jana zirav(werem).

Mem, bi wan derd û kulan va diçû eskeriyê. Rêka Sariqamişê, rêke dûr wû. Çûyîn hewû, lê hatin kesî nedizanî. Bavê wî, ew delalê xwe, delalê dil neçûyî sêrî, delalê bi jana zirav nexwaş, bi hevalan re, bi şîneke mezin û bi kilamên dilşewat kire rê.

Digot; "Ro ji bana nare bana Lawikê bi dergîstî wusan bûyê ji toxtor û dermana Telê bi tenê yî li eskerê Xermanê xwe mane li şûna xermana Ezî guhdariyê dikime li cîrana."

Mem, du meha li Sariqamişê ma. Dûra şandin gund. Eskeriyê, malan wana bişewite, gotin; "Vaya yî nexwaş e. Ji me re tu karî nake." Ji eskeriyê îxrac kirin. Mem vejerîya hate gund. Bavê wî, delalê xwe toxtor bi toxtor du salan gerand. Lê tu avil nekir. Ji hêlekê de dilê ku neçûyî sêri, ji hêlekê de eskerîya di nîvi de mayî, yek jî derdê din; jana zirav. Hêdî hêdî Mem diavitin bin xwe. Her roj derbas dibûn, zeîf diket, jar dibû. Xalê wî yê ku jê ra digotî "Xwarzîyê kê, tu ûda xwangê minî. Bê xalikê te ji te re çî bike? Tu dizanî, ezî pirî yare te me." Her roj, ji gundê xwe de dikete rê û dihat cem wî rûdinişt. Lê tişteki kes bike tunewû. Felek î xain wû. Wê kirina xwe dikir.

Rojekê li xalanê Memê, cîranek ji xalê Memê re dibêje; "Van derdana, va derdên giran toxtor nizanin çareser kin. Tu dizanî, mezinên me wexta toxtor tunewûn, bi xwe û xwe li çareserîya nexwaşîya digerin. Ez hevlekî nas dikim. Nexwaşekî giran wû. Toxtora ji derdê wî re tu çare nedîtin. Mezinêkê, jinekê gotîyê; herin goştê cêwrekî, cêwrê kûçika bikelînin bidin wî. Nexwaşê we yê ji vê nexwaşîyê xilasbe. Bi ser wê gotinê de, ew jî wê dîkin. Ez nas dikim, ew merîya hê dijîye."

Xalê Memê, merîyekî bi nimê(nimêj) û bi avdest e. Li dina derewin kirî û xwariyê. Kurikên xwe mezin kirine û zewicandine. Heca xwe kiriyê. Dest ji karê dina derewîn berdane. Ji bo dina xwe ya ku heq dizane, çî ji dest ve tê wê dike. Xwe ji bihişta ku ji wî re waad kirine re amade dike. Ew gotina; goştê kûçika xwarin, ji bo olî(dîni) gune ye. Lê çî bike? Nexwaş Mem e. Xwarzîyî wî, telayê bit enê û ûda xwanga xwe ya bibext e. Xortê bermirad e. Bi xwe û xwe difikire. Di serê xwe de, van herdu giranîyan dike tasa terazîya serê xwe. Bihişta hatî waadandin an jî xwarzî? Ji ber vê yekê, xewên xwe yên şeva direvin. Çend rojan guh dide ser xwe. Siwekê biryara xwe dide û radibe.

Li ereba hespa sîyar dibe, dihere gundê xismê xwe, cem xwarzîyê xwe. Ji Memê re; "Xwarzî, ez bê te nabime. Damîşî te nabime. Were, bi min re here xalanê xwe. Heftyekî jî, li cem xalî xwe be. Ez bi dest xwe xizmeta xwarzîyê xwe bikim." got. Misada wî, ji bavê wî dixwaze û xwarzîyê xwe bi xwe re dibe gundê xwe. Çend roja li gora dilê xwe xizmeta xwarzîyê xwe dike. Rojekê Memê dibe nav pezê xwe. "De xwarzî mêze ke, ka xalî te çî pez û berx gihandine hev.) Kîjan kar û berx çû xoşê te û tu pê qaîl bûyî nîşande." got. Mem li nava pêz, kar û berxan digerîya. Rahişte berxeke guh bi per û belek. Got; "Xalo; vaya berxeke çiqas rind e." Xalê Memê, kete bin çengên wî ew bire hundir. Bangê xanima xwe kir. Got ; "Wê berxa ku xwarzî nîşan dayî serjê kin, wûnin bi ber xwarzî min din. Memê eman xalo, ew berxika pire rind e. Wê berxa rind serjê meke. Tu dixwazî yeke din serjêke." got.

Memê hay jê tunewû. Li maleke cîrana, xalikê wî, ji bo ku nekeve şikê, cêwrekî kûçika serjê kiriwû. Sifre hate dagirtin. Li ser sifre xal û xwarzî rûniştin. Çiniyê goştî cêwrik, siftê xalê Memê kire devê xwe. Ê hetanî goştê cêwrik xilas bû bi xwarzîyê xwe re tevhev xwarin. Lê çî bikî; feleka xaîn dîsa jî bi a xwe kir. Ne fedakarîya xalê, ne dilê Memê, ne jî xortanîya wî tu neda berçavên xwe. Ew ji dest dost û yaran girt û bir.

## SEPANA QÎTO

Abdulhalik Duran

Havîn bû. Germ bû. Bayê germ derûdor dişewtand.roja bi tîn ser gund re digeriya. Mirov û heywan li ber sîyê xwe ji tîna rojê diparastin. Rojê tîna xwe dida her tiştî. Tîna xwe dida zaroka, mezina, dida çîya, deşta û dida ziyânên wan jî. Roja bi tîn gundîyan ra bi ezêb xuya dikir. Lê belê boyî zîyana jî va tîna tişteki giring e. Gundîyan jî va rewşa zanî bûn. Roj germ bû feqet gundî li ser xebata xwe bûn. Kar dikirin. Bi traktor, kamyon û makîna çinandinê dixebityan. Va demana dengê va vasîtana kêman nedîbûn, li nav gund. Kar gelek hesan bûn feqet wekî din kar û xebat tunene boyî ziktêrbûnê.

Gundekî mezin bû. Gelek mirov dijiyan li vê derê. Derûdora gund zîyan bûn, derya zîyanan. Di nav derya zîyana da gundekî bêxwedî. Werê xuya dikir ku va gundê bêxwedî di nav deryaya zîyana da mîna gîravê bû. Rê jî mîna marê deryayê serî xuya nedikir.

Bayê germ hedî hedî li zîyana dixist. Pêlê deryaya zîyana gelek baş xuya dikirin. Lê belê dengê ku derdixistin pir tirsehez bû. Ji dûr ve bêhna zîyanên nû hatine çinandinê dihat. Bêhneke taybetî û cuda. Bêhna hereket, bereket û aboriyê. Di nav gund da telaş, xebat û bazdan.

Li hêla gund babilîsk hate meydanê. Babilîsk di dora xwe ra diziviriya. Di nav babilîskê de qêrîna zarokan bi ken, bi henek. Di vê babilîskê de sepana dest Qîto de li erde ket. Hevalên wî pêlê sepana Qîto kirin û ew şikandin. Bû qerînîya Qîto:

- We sepana min şikand.
- Min neşikand.
- Min jî neşikand.
- Kê şikand lê?
- Qîto, di vê babilîskê da her kesî pêlê kir.
- Qîto te bi vê sepanê gelek çûçik kuştin. Rind bûye şikestî sepane te.
- Li te ra çî ye. Çûçikê Xwedê ne, yê te nine!



– Ew jî gune ne. Canê wan jî heye. Ez îdî naxwezim ku tu çûçika bi sepane bikûjînî.

– Ci hero lo...magî...!

Bi henek û bi şahî zarok bervî gund beziyan. Ketin nav gund û li ber çawan winde bûn.

Qîtoyê kejê 13 salî bû. Bave wî, Qîto dema ku şeş salî bû mir. Malbatê de yê herî mezin ew e. Erdê malbata Qîto pir e. Aboriya xwe bi wî erdî dikirin.

Qîto di gund de pir navdar e. Navdariyeke ne baş. Navdariyeke xeter, kirêt û bi qeda bi rastî zarokekî bê kêr e. Lê belê hereketê Qîto carcaran bi gundîyan re şîrîn dihat.

Di gund de va hevokana boyî Qîto her roj dihatin gotin û bîstin:

– Qîto bi sepane çar pênc çûçik kuştin.

– Qîto îro cam şikand.

– Qîto îro li dibistanê li sê xwendekara xist.

– Qîtooooooooooooo.....!

Qîto tu cara şûna xwe da nediseknîya. Bi roj û bi şev li ser linga bû. Her dem hereket û bezandîn. Bêkêr bû. Bêkêrbûna xwe ne hereşeye. Boyî mirina bavê xwe pir bi keser bû. Carcaran bi veşartî digiriya. Bêbavbûn jê re zor dihat. Êşeke mezin, êşeke bêderman û bêçare. Va rewşa gelek ew dilerizand.

Hevalên wî gelek in. Bi hev re li çîya û deşta digeryan. Serokatî bi hevalên xwe ra dikir. Dema ku hevalê xwe nedihatîn jî, bi serê xwe digerya. Gundîyan li wî û li hevalên wî pir hez dikirin. Boyî alîkariyê bangî Qîto û hevalên wî dikirin. Gundîyan bê tirsbûna wî û agîtbûna wî hez dikirin. Lê belê hereketê wî hez nedikirin û wî ra hêrs dihatin:

‘Çûçik kuştin’

Çûçikkuştin boyî Qîto gelek bi kêfeke mezin e. Tişteke fir didan gîştik hedefa Qîto ne. Çûçik kuştunê da bûbû hosdad. Çûçikeke li kudere didî bi sepana xwe lê dixist dikuşt. Bexş nedikir. Nîşangirekî bêtirs bû. Sepan û Qîto bûbûn yek. Qet li hev ne diqetyan. Gundîyan Qîto re digotin ‘qatile çûçika’. Qîto boyî vê hereketê gelek gef digirt. Feqet Qîto çûçikkuştin bernedida.

Dîya Qîto digot:

– Lawo, bes e îdî çûçikan mekujîne. Ez şîre xwe li te helal nakim.

Xozanê kalê gund digot:

– Lawo! Li dinya din ev çûçikana ê mafê xwe bixwazin. Boyî kêfê çûçikan mekujîne. Li dinya din ê li te were xwestin, ew jî can in. Jîyana wan jî heye.

Hevalên Qîto:

– Qîto bes e, te li gund çûçik nehiştin.

Lê belê Qîto kesek nedibîhist. Sepana xwe digirt bi hewalen xwe va derdiketin kolana û li çûçika dixist. Rojekî Qîto, bi hevalên xwe va duwazdeh çûçik xistin. Qîto tenê li heşt çûçika xist. Hevalên Qîto, Qîto re digotin:

– Hosdad, tu nêçirvanekî mezin î. Sepana te bi sîhir e.

Du sê meha şûnde, rojekî Qîto li sibe cîhe xwe rabû. Devriyê xwe şûst û boyî taştê çû hêka bîne li axur. Hundire axur tarî bû. Lingê Qîto li teneke ket û li erde dirêj bû. Dema ku li erdê ket serê xwe li girşe xist û bîrve çû. Mirîşk, dîk û culiqê ku di axur de li dora Qîto civîyan. Qîtoyê bê hereket nukil kirin. Mîna heywanên wahşî nukil dikirin. Serçav û dest pîyê Qîto di xwînê da hiştin.

Ji boyî dengê dîk û culîqa dîya Qîto hate axur. Derîye axur vekir ku çî bibîne. Qîto bêhereket li erde dirêj bûye û serçava xwe xwînê de mayî.

– Qîto ev çî ye? Dîk û culiqan li te çî kiriye. Milê te qul bûne. Xwedê mino. Rabe rabe.

Hate cem Qîto û serî leqand. Bi leqandinê Qîto çavê xwe vekir û rabû ser xwe, got:

– Oy ruye min, dest pîyê min pir diêşe.

– Zûke zûke derkeve em herin doktor.

Qîto birin doktor. Dûra şandin nexweşxaneyê. Qîto pir xwîn wînda kiribû. Ji wî ra xwîn ditin. Sê çar roja şûnde Qîto şandin gund. Qîto li mirinê filitî. Gund va hadîsa bîst û jî wan ra acaib hat. Li gund gelek zîyaretvanê Qîto hatin boyî derbazbûyê. Xozanê kalê gund ji wî re got:

– Qîto, te gelek çûçik kuştin. Çûçikên ku nikaribûn bifirin, heyfa çûçikên ku difirîn hilanîn. Heyf li te girtin. Vê bizane.

Ji vir şûnde Qîto dest bi sepana xwe û çûçika neda.

# PÊKETÎN

## LÊ PÊKETINA ÇÎROKA HEBÛNA ME !

Berzan Çelebi

Ez hîn xort bûm. Xwûn di bejna min da mîna teyrekê difirî. Deqekê li şûna xwe nedisekînim. Ji xortên weng ra li gundî me digotin; “Î bi çavekî li dora xwe mes tike.” Li hêla din jî, di mejoyê min de çend pirs bi hevdu dilîstin. Heşê min tim li ser wan bûn. Bi meraq û bi hêvîyekê bersiva van pirsan digerîyam.

Li wê demê, Kalê min hîn dijîya. Pîrlîxê xwe qebûl kiriye û li mala xwe rûtenişt. Mêrekî zana û pêşdîtî bû. Nizam kînge? Lê min Rokê, meraqa dilê xwe anî zimên û jê pirs kir got:

– Kalo ! Heyrana te, çend pirsên min ji te hene. Ger destûra te jî hebe, ez dixwazim tu vê meraqa dilê min da belav kî. Tu Kalê min î û dîrok jî dilê te de ye. Min ji nav va gumanan derxîne.

Kalê min li pê dawestî bû. Pişt lê xar bûye. Çermê dest û rûye wî lê qerçimîne mîna rûpelên dîrokê ne. Mîna rûpelên heta niha nehatî xwendin û zerbûyî. Kalê min di jîyana xwe da pîrr tuneyî û zehmetî kişandîye.

Bersiva min da:

– Lawîkê mino! Pirs ji ser zimên da neketîyo ! Ew meraqên di dilê te da çi ne ku tu qet ji yaqê min navî?

Roka were, tu jî pîr bî û ê ji te jî weng pirs kin. Xuyaye ku ê hêfa min ji te heynin. Te bê! Ji min çi pirs kî, pirs ke!

– Kalo! Çend demên dirêj in ku ez li dora xwe mes tikim. Em li gund çend qebîle henî. Tu jî dizanî ku wextak em bi bîçerê terinî alîyê Urfê û Dîyarbekîrê zevîya diçinîn, li wir em bi eşîrên kurdan re tîn ba hev. Ew jî mîna me ne. Tu ê bêtî ha gundê me,

ha gundên wira. Ez difikirim, Kalo em jî ji wir hatinî? Ger em ji wir hatinî sedema hatina me çi ye? Em kînge hatinî?

Kalî min siftê dengê xwe dernexist. Paşê dor xwe mes kir. Hêla hewşê keviyekê di û li ser rûnişt. Ji berêyê seqoyî xwe tebaxa tûtînê derxist. Tebax ji Diyarbekirê, tûtîn jî ji Bitlîsê bû. Çend salan ber wê li wir standî bû. Xet derxist û giran giran pêça.

Çeqmeqê xwe derxist û cixara xwe vêxist. Min li wî mes tîkir.

– Teww... Lawî minî delal. Tu çima pirsên weng giranbiha ji min dipirsî? Êş û kulên ku di paş min de mayî tinî bîra min. Te xêr e? Ji min çi dixwazî?

– Na Kalo, na! Derdê min ne dilêşandin e. Derdê min, dîroka çolê ye û dîroka me ye. Çol çing ji mera bûye qeder?

Kalê min ji cixarê qulteka kûr kişand û çavên xwe berdan rêya li ber me dirêjbûyî û dûmana cixarê jî li ser min belav kir.

– Lawikî mino, va pirsên ku tu hîro ji min dipirsî, demekê di diliê min da jî dibûn meraq. Ez jî li bersiva wan pir gerîyam. Her çiqas min pirsên xwe ji kal û pîrên dor xwe dipirsî, wana jî dixwast vê meselê tevnedin ji bîr bikin.

Ew mesele çi êşeka giring û bêter bûye ku li wê demê da; gel ji jiyana xwe poşman kirine û bin zulm û zordariyê da ji însanetîya xwe fedî dikirine. Sîrgûn ji bo gelê me bûbû wek mirinê. Gel di nav xwe da dipirsîye; me çi kiriye ku ji me ra dîsa ferman derxistine? Em li welatî xwe baş dijîyan. Bê zordarî, bê sûç, bê mahkeme. Di nav vê sîrgûnê de dem ne baş bû. Hêlakê de sar û sarme û zivistanê; hêlakê de nexweşî ketiye nav gel û pir însan jî mirine. Reçûyîne de jinan şîn jî digirtine. Dengê hawara dayîkan loran loran li erd ji ezmanan de dihate bihîstin.

Di çavên kal û pîran da stêrk mîna baranê dibarîne. Keç û bûkan biskê xwa diqedandine. Xortên ciwan him gel diparastin him ji lapên destên û didanên xwe tigişti. Him jî kerîyên xwe didan ber xwe û diçûn. Toz û duman bi sar wan ketibû. Mirin ji wan dûr nediket. Ev çi feleka me xayîn e ku hetta vê demê da em bi hev du re bi pîzbengê dest û lingên me giredayîne. Gel ji

hardareke mezepotamyê tevrabûye. Qebîle eşîr gîştik tevhev bûne. Heta niha tu caran ji bo welatekî doz bi hev ra negirtine. Lê kêr hatiye li hesti ketîye. Ji bo can û mal xilasîyê doz bi hevdu re kirine. Ji ber zulmê û zordariyê rivîne. Gel şev û ro sar, çîya û banîyan de gehîştine Enetolîya Navîn. Zordar gehîştine planên xwe. Gel perçe perçe kirine. Dest jî erîşan berdayîne. Li wê demê tehcîr û sîrgûniyê da gel ji mirovên xwe qetîyaye. Hevdu wenda kirine. Kî kuda çûye? Kî mirîye yan jî ne mirî ye. Bê xeber, jîyaneke wendabûyî dest pê kir. Daykê kalê min digot; "em li alîya çemê Firatê dijîyan. Nesika Êrfê û dor Bozovê yan jî Surucê. Li alîkî eşîra Barazî dijîyan, li alîya din jî Bezîkî dijîyan. Jîyana me pîrr xwaş bû ye. Herkes qelav bûye. Mala bavê min nêzîkî dehe kerîyên pez hebûne. Sal bi ser salan da derbas bûye. Bira birangî xwe tesedufî li welatekî din tibînin û ser hevdu da digîrîn. Kurîkên xwe bi hevdu nav dîkin. Derêk lê dijîn ji hevdu cûda terin. Ez jî ji kalîkên ji pêşîyê da heta vê çaxê navên çar kalîkên xwe dizanim. Êdin nizanîm."

– Kalî minê bi rih û rahman. Ez hayrana te me. Min bi vê pîrsê dile te eşandin da. Li qûsîrê min û kêmasîya min mes nekî. Tu jî dizanî ku van eşên li ser gelê me hatine lîstandin em tu cara bîr nakinî. Em ji hêş û mêjîyên xwe temal dernaxinî.

## ÇAVŞÎLANÊ

Çavşîlana min  
Mêla xwe bide asoyên me  
Dîsa ewrên reş ber hev kirine  
Tarîne

Çiyan mij û dûman girtî  
Di şevan de  
Hîv û stêrkên veşartî  
Rê li ber min wenda kirine

Qulinga hasreta min  
Perê wê de  
Li nivê rê bi bîrine  
Ji refa xwe qetîyaye  
Silavên min li deşt û çiyan  
Bêxwedî cî hîştine

Çavşîlana min  
Jiyan bê te ne şêrîn e  
Çavên min li rê  
Dibe ku rêwîyek  
Silav û sifetekî te bîne.

Mem Xelikan



## ÇARÎN \*

### Omer Hayam

Kuştin jî jîrandin jî şîpê te ye  
 Yê ku vê dinyê çerx dike jî tu yî  
 Em bèn ez ne yî baş im, qebata kê ye?  
 Yê ku ez weng anîme dinyê ne tu yî?

Ji vê dinyê bêtir dunya tune, lê megere  
 Ji min û te bêtir kesî difkire tune, lê megere  
 Saxiya xwe jê bike, xwe mewestîne  
 Ew tiştê ku tu dibêjî heye, tune, lê megere

Ji binî erdê bigre heta hêstêrkan  
 Tu sirre ku em negihêştinê neman,  
 Dollê însên her girêyek vekiriye  
 Keseki ku girêya ejil veke heye?

Sal mîna roja derbas bûn çûn;  
 Ka li ku ne derd û şahîyên berê?  
 Yê hişgihêştî guh nade belayê:  
 Ew ê bê, mîna her tiştî va jî derbas be.

Kê dîtiye cenet û cehenem?  
 Kî çûye û xeber anîye?  
 Dunyake ku kesî nedîtiye  
 Ma ew rewayî dilxwaztinî û jêtirsînîyê ye?

\* *Nub Ateş* ji zimanê *tirkî wegerande kurmancî*

Her roj yekê derkeve bibê, ez ez,  
Xwe bi zêr û zîvên xwe bipesine.  
Dema karê wî baş kete duzanê:  
Ejilê ji kêndêl derkeve pêş, bibê: Ez im ez.

Kûzek stand min ji bazarê;  
Bi dizîkî pir tişt gotin min;  
Ez şa bûm, qasekî min î zêrinî hebû;  
Niha çi me? Ji şerebê ra bûme kûz.

Va kûza yekî mîna min bû;  
Dilê wî li yekê bû, bi xem bû.  
Kî dizane, belkî destî ye bi stû da  
Ji destê êvîndareke gewr û khal bû.

Êvîndar îro tu rindeke bi tonekî din î;  
Wekî hîvê yî, kenê te dibiriqe.  
Rojên eydê rindên xwe bixemlînin;  
Lê rûyê te ê eydan bixemlîne.

Heyîyeke ku ji dest neçûye heye?  
Her tişt rojekê ê ji dest here.  
Ku weng e xerê, çi li heyî û tuneşîyê mêz dikî?  
A rind, tuneşîyê wekî heyî, heyîyê wekî tuneşîyê bizane.

Li cenetê horî hebûne, çavreş;  
Meya xwaştir jî li wira bûye.  
Qe qalê meke, em ê zû va da li cenetê bûne:  
Mêz ke, li hêlekê êvîndar, li hêla din şereb.

Dilopek şereb bedelê konaxên Tuse ye  
Rindtir e ji textê Keykubad û Keykavus  
Nalîna êvîndaran li berbangê  
Rindtir e ji azana softeyê durû.

---

Ji medresê xêr nayê, guh bide min;  
Parîyê weqfê ê hundurê te reş bike.  
Here li dereke xerewe xizan bijî:  
Ew dera te bike Padîşah.

Kê gotiye Hayam heramîyê nizane?  
Ez heramî û helalîyê rind ji hev derdixim:  
şereba ku ez bi teva vedixwim helal e,  
Ava ku bê te vedixwim heram e.

Her sibê, dema ku rojê nû heltê,  
Rojek jî ji emrê me kêr dibe;  
Her berbangêk wekî dizekî ye  
Yekî ku çire di dest da tê.

Kilama Fatê Xelê ji gundê Altilerê ji dengî Fatê, xwûşka wê Altunê wergirtiye.

Xwenga Fatê Xelê, Gula Heciomer di panzdeh saliya xwe de serber tev çû. Fatê li ser wê ew kilama li jêr gotibû. Bi şeweta xwenga xwe Fat bû şareyek bi nav û deng. Fatê li ser xwenga xwe weng gotibû;

Were were Gulê were  
Ka mala ku kekî min çêkirî tu dayî berê  
Xwedê ji pênc sala şûva dergûşek da xwenga min  
paşê li xelkê biyê zelberê  
Gundo Gulik çinga rind e  
Ê mîna ji meyayek ji jêr da tê pîl bi cang e

Gulik bûka malê bavê  
Ê li goristanê Altilerê ramediyê  
Bogirê li bê, ênîyê li tavê  
Eza bi kurbana xwenga xwe kim cutê metikê min ê  
di destî hev de sondxwarî ne li mala bavê

Gulik keçika Êma Dînê  
Felekê di taldî sanciya de tide qolincên xwenga min dihelîne  
Ji herdê xelkê jinek e  
Ji herdê min pişt-paza kekî min î siwara ser mehîn e  
Feleka bê bext carekê musadeke  
Ma dergûşê xwe goçke, bimêjîne

Xwengê dilê min ji duh va  
Birînê min helgirtin kulê min ji nû va  
Kekî min çiqasî dilqeyîm e  
Go ma bi kurban be Miçkî min bi Remikê va  
Ev Xwedê dane te ji derd û kula ji şêşt salî bi şuva

Were were bûkê were  
Rêka dewrê hatiye ber e  
Ez kurbana çavê çaqir  
Şem kurbana perçema zer e

Li nav nava bûkê li nav nava  
Şerî felekê li ber mala xwenga min heltîne gava  
Mala xwenga min şewitî ji çava  
Tu ê hîna genca malecer î  
Îşê te çî ye li nav şîna û li nav zirava

Gula dilê min î hêwo  
Gavkê tere gavkê têyo  
Mala baciye min a şîrîn î bi me tal biyo  
Em carka din narinî malê Heso wo.

....

**Berhevkar: Altun Başaran**



Ji bo pêşbirka senaryoya filma kurdî

*Şirketa produksiyona Frensi ya filman ARCEN-CIEL FİLM bî piştgirîya 5 sazîyên Ewropa li Parîsê dawîya sala çûyî pêşbirika senaryoyên kurdî ji bo kurtefilman çêkiribû. Nivîskarê Bîrnebûnê Nuh Ateş jî bi senaryoya xwe ya li ser navê "BÊTAR" tevê bûbû. Encamên pêşbirikê hîn nehatiye aşkerekirin. Em senaryoya "Bêtar" pêşkeşî xwendevanên Bîrnebûnê dikin.*

Redaksîyon

## BÊTAR

Nuh Ateş

Heyam lihevketî bû. Li Tirkiyê, sala 1980î eskera desthilatdarî hîn nû bi dest xistibûn. Her ro, meriv dihatin girtin. Di hebixanan da eziyatên giran li mehkûman dihatin kirinê, berî giştan jî li ronakbîr û xwendevanên çep û kurdên netewperwer. Pir kes revok bûn, xwe vedîşartin. Cendirme gund bi gund digerin, meriv digirtin û şîleh berehev dikirin. Rojke havînê dor hatibû gundê Pêxasan.

### 1. LÎ GUNDÊ PÊXASAN, LÎ MALA HESENÊ MÎSTÊ, DANÊ ÊVARÊ, LÎ HUNDUR:

Gundê Pêxasan, gundekî kurmanc li deşta Heymaneyê (Enqere) ji sed malî ye. Di mala Hesênê Mistê da şîn û xemgînî bû. Lawê malê Gelho, yê ku li Enqerê li mekteba bilind dixwand çend roj in ku wenda ye û jê tu xeber tune; xwaş e yan

miriye kes nizane. Xaniyê malê ji kevir û kerpîçan çêkiribû. Çar ode û mabeyneke xwe hebû. Li odeyekê jin û li ya din mêr rûniştibûn. Mala Hesên ji hêla aborîyê va ne xeraw bû. Li odeya mêran ya ku bi xalî, kulav, balîf û minderên reng bi reng hatibû rêxistin, bi xwedîyê malê Hesên va tevhev çar pênc mêrên ku gihêştibûn nivê temenê xwe rûniştibûn. Xortekî çay belav dikir. Virevira çay vexwarinê li odê bilind dibû.

### Mêrek:

Bi îro va bûne çar roj ku esker hatine ser têxt. Mala wan nekeve, dibêjine, bi dehhezaran meriv berhev kirine û avtine hebixanan. Kes nizane ku yên kuştî û mîna Gelho yê Hesên wenda bûyî çiqas in! Xwedê

bêtara weha neyîne serê tu kesî ! Ma qet tu xeber ji Gelho tune?

Hesen li serî ba kir:

Na!

**Mêrekî din:**

Tê gotin, ku ji gundê me ji xêyrî Gelho sê çar kesên din jî wenda ne û ji wana jî tu xeber tune! Mala minê, xwedana gune ye ! Hesen bira, xwe pê nehêşîne, tiştêkî ku em bikin tune, Xwedêyî mezin e, înzallah tu tişt naye serê wan!

Hesen merivekî dirêj, zirav û simbêlqeytan bû. Va bûn çar roj ku wî, mîna kesên bi şîn, rûyê xwe kur nekiribû. Serî kiribû ber xwe, bêdeng û bi xwedaketî rûniştibû. Cixarek bi yekê vedixist û bi hêrs dûtê cixarê dikişand û berdida. Her ku deriyê odeyê ji hev dibû, dengê şînê ji odeya jinan dihat û ew pê xembar û kelegirî dibû. Lê wî girîyê xwe digirt.

Li odeya jinan qasî heft heyşt jin hebûn. Piranîya wana xeftan li xwe kiribûn û serên xwe bi kofî û şarên bi gulî pêçabûn. Jin û bûkên malê reş girêdabûn. Keywanîya malê Kewê resimê lawê xwe, Gelho di dest da, ew vir da û wêda dihêjand û pê ra distra, te yê bigota qey Gelho miriye. Jinên din ji bi rû wê diketin, geh bi wê ra distran geh dikirin iskeisk digrîyan. Carina jî wana bi hev ra dengên wekî, “wîh wîh

wîh” dû ra, “ahoî, ahoî, ahoî” derdixistin û bi mistan li sîng û berê xwe dixistin.

## 2. LÎ MALA BAVÊ GULÎZERÊ -DANÊ ÊVARÊ, LÎ HUNDURE MALÊ:

Li gundê Pêxasan keseka din jî bi dizîkî şîn dikir, ew jî dilketiya Gelho, Gulîzer bû. Ji ber ku dilê wê bi dizîkî bû û Gelho jî hay jê nebû, Gulîzerê bi êşkere şîn nedikir. We şareke reş li enîya xwe girêdabû. Ew pir bi berxweketi bû. Çavê wê avî, benz û bedê wê qetîyabû; zerikî bûbû, te digot, qey ew bi zerikê ketiye. Wê gilîyê xwe dikire ber hevala xwe, dotmama Gelho, Zêwê. Tenê Zêwê hay jê evîna wê hebû. Gulîzer li odeya mîvana rûniştibû. Bi çavên avî, gir û belek û bi nêrînên melûl li niqteyekê mêz dikir. Wê derîya Zêwê dipa.

Zêwê derî vekir û kete hundur û ber bi Gulîzerê çû, destê xwe avite stûyê wê, paşê piştê wê mist da:

– Çaxa te bi xêr be!

**Gulîzer** hindik şabû:

– Bi xêr hatî hevala min ya bi qedr! Baş bû ku tu hatî!

**Zêwê:** Mala te ava, ji bo van şorên pesnê! Çawa yî baş î !

**Gulîzer:** Wekî ku tu dibînî ! Êşa min giran e, dilê min wêran e!

Zêwê bi dîqet li serçavên Gulîzerê nihêrî:

– Malava, te dest pê şaretîyê kirîye. Lê benz û bedê te baş xuya nake, rûyê te zer bûye, wekî yekî ku bi zerikê ketî!

Gulîzer bi awayekî bi ber xwe ketî:

– Xewa şeva li min tune! Dilê min qet naçe ku tiştêkî bixwim yan vexwim!

Zêwê: Ma tu dîn î, çima tu xwe weha xerab dikî, bi vê çî dê bi destê te keve?

Gulîzer: Ku ez ne dîn bibama, vana nedihatî serîyê min! Ji Gelho da xeber heyê?

Zêwê serî li rast û çep hejand û brûyên xwe ber bi jor helnan:

– Na! Şeva çûyî min xewnexofek dît.

Gulîzer: Xêr e!

Zêwê: Dawetek hebû. Şahî bû, dengê dohl û zîrnê bi dunyayê dabû. Ro nivro bû, ji nişkava ewrekî reş dagirte ser ezmanê dawetê. Her der bû tarî, ewir li hev ketin, brûskê venna, ba bahoz rabûn û di dû ra bareneke şên lê kir.

Gulîzer: Ne xewn e, tu dibêjî qey tu qala bêtara ku hatiye serê min dikî.

Zêwê: Tu tim li tiştê xeraw digerî. Di xewnan da barîna baranê nişana xêrê ye!

Gulîzer: Nizanim ku çima tellîya min weng xera be! Qet nebûya Gelho hay jê hebûya ku dilê min li wî ye û ez her sal rîya wî çav dikim da ku ew ji xopana Enqerê vegere mal ku ez wî bibînim.

Zêwê berê xwe ber bi Gulîzerê kir:

– Ma min tim ji te ra nedigot, êvîna xwe ji Gelho ra bibêje, lê te bi ya min nedikir. Dîsa jî hêvîya xwe nebire, Xwedê mezin e, hunê rojekê bigêhin hevdu!

Gulîzer Keserek kûr kişand:

– Xwazika min bigota wî!

Herduyan li çavên hev mêz kirin, kelegirî bûn û xwe avêtin hem-bêza hev, dest li stûyê hevdu pêçan û girîyan.

### 3. LÎ ODEYA MIXTÊR ROJEKE HAVÎNÊ / BERÎ NÎVRO:

Neh deh roj derbas bûn. Rojêke havînê berî nivro bû. Heyam xwaş û hênîk, ezman sayî bû. Mixtar û birrek axeler û rûspîyê gund li odeya mixtêr komî serhev bûn. Ew dişewirîn û ketibûn nav fikir û mitalan. Çay vedixarin û cixare dikişandin. Xanîyê mixtêr ji kevirî reş çêkiribû. Odeya mixtêr bi xalî, balîf û minderên rengîn raxistibû. Hal û wexta mixtêr baş bû. Ew merivekî qut û qalind bû. Pozekî wî yî gir wekî balcanê hewû û wî

berî hertiştî mêla meriva dikşand. Mixtêr nedihîşt ku porê sêrî birûze, hema kur û kurisik dikir. Weki çend axelerê gund, wî ji fotir (şebqe) dida serê xwe.

Mixta bi dilnexwazîyekê:

– Duh ez li qezê bûm. Cendirme duh ne pêhr çûne gundê Bêzikan sîleh berehev kirine. Ji her malekê sîlehek xwastine. Yên ku sîlehe xwe tuneyî jî sîleh bi pera standine û anîne teslîm kirine. Min sercendirme dît. Ew ê van rojana werin gundê me. Di destê sercendirme da lîsteyek navan heye, tê da navên çend xort û xwandayên gundê me jî heye. Min ji sercendirme ra got, ew xortana cahîl in, kirinên wana em jî baş nabînin. Niha ew li gund tunin. Ewê revok in, kes nizane li ku derê ne. Belkî revîyana çûne der welat.

Hal û hewal weha ye, de keremkin, her kesek nezera xwe bibê û gerek e, em li dawîyê bên ser fikrekê.

Rûspîyek bi rûyekî tahl:

– Hun jî dizanin ku mala min qet sîleh neketiye. Ji sed malî gund belkî di deh-panzdeh malan da sîleh heye. Ma va heq e, ku her malekê mecbur bikin da ku ew sîlehekê peyda bike û teslîme cendirma ke? Navê vê xerac e. Heger me go, erê û ji wana ra huro sîleh peyda kirin, ewê sibe tiştêkî din bixwazin û

paşîya xwaztekên wan naye û ew ê werin bikevin malên me.

Hin guhdaran bi meneya tesdîkkirina van gotinan serî berbi jêr hêjandin. Hena jî serî bi meneya nerazîbûnê berbi rast û çep bakirin.

**Mixtar:**

– Rûspî, gotinên te ji hêlekê da rast in. Lê niha ku em sîleha nedin, ew ji derîyê me nabin. Ew ê vê ji xwe ra bikin bahane û her ro werin û esil hîngê ewê bikevin malên me. Ewê me bibin qereqol û bi me eziyatan bikin û belkî me yek bi yek mecbur bikin ku em sîleha tedarîk bikin. Bi nezera min, sewa ku qede û bela wana di me negere, baştir e ku em sîleha tedarîk bikin bidin wana.

Di pey van gotinan va, yê ku bi serî hêjandinê şorên mixtêr tesdîk dikirin zêde bûn.

Axelerekî yarenîhez:

– *Sîleh berehevkin tiştêkî pir baş e, lê gerek e tenê ji malên ku sîlehan tê da hene. Bi vê rê gundê ji sîlehan pak bibe. Xwazika yek hebe, sîlehên dest eskeran da jî berehevke, a pir rind bibe. Sahî va Sercendime î zewicîye yan na? Heger ew hîn nezewicîye yan jî mêrebî ye, em jinebîyeke gund lê mahr kin, hîngê hevsarê wî ê bikeve dest me.*

Wî bi rûkenîyekê van şorana gotin. Te nedizanî ku ew bi rastî dibê

an bi yarenî. Bi ser van gotinan da, pêçekê heyam nerm bû û mirûzê tahl li rûyên hin rûniştvanan bû ken.

Rûspîyekî din bi awayekî li ser xwe û cidî û bêî ku hestên xwe nîşan de:

- Gotinên mixtêr ne rast in, lê maqul in. Tenê bi vê rê, em ê zîyana ku bigêhê me kêmtir bikin. Bi-aqiltî ne ew e ku meriv dîna azar bike, baştir e ku meriv wana bixurîne û mist de.

Gundîyek bi hêrs:

Van elemetên neçê giştik ji av û rûyên xort û xwandayên kominîst û kurtçî da têne serîyê me. Xwedêkê niha em bi zimanê xwe napeyivîne û kê bi me ra gotiye çi? Goya xwandana ne; xwedanan malên xwe tê da şewitandin, ew şandin xwandina bilind, lê wana xwandin cihîştin û çûn ketin pêy dewa kurmanctîyê.

Merdo li odeya mixtêr piçukê civatê bû û lewma li dawîya odeyê rûniştibû. Navê wî yê heq Biloyê Mistê bû. Ew birayê Hesên û apê Gelho bû. Ew bi bejnê û tenikîyê li Hesên çûbû lê bi taybetên xwe yê xas û wêrebûnê lê neçûbû. Ew î pozberan bû. Wî şorê xwe nedihêvşand û devê wî nedisekinî. Wî xwe li hember gotinên gundî zept nekir.

Merdo di cîhê xwe da, nedisekinî, xwe vir da û wê da di hev dida:

-Bibaxşînin, şor li min nekeve, lê devê min î nasekinê. Xortên ku hun qalê dîkin ê dibêne, ma îmkan hebe, ku em zimanê xwe li mekewan hîn bibin û bi kurmancî radyo û gazete hebin. Wekî din jî, ewê li heqê şivana, pala û cotkara digerinê. Ma va tiştina ne maqul in?

Gotinên Merdo li hesawê mixtêr û axeleran nehatin. Lewma dora peyivînê hate bédengîyê. Bîstekê kerr û lalî li odê belav bû.

#### 4. LÎ PÊŞ DUKANÊ DORA NÎVRO / LÎ DERVA:

Di jêrî malê mixtêr ra camîya gûnd, di bogira camîyê ya çepê da dukanê Memedê Kinik û li pêş camîyê jî meydana pan û fereh hebû. Li pêş dukanê komek xortên neh-deh salî gihêştibûn hev û benda qalikê kelek û zebeşan çav dikirin. Dema ku mezinan li dukanê kelek an zebeş diqelaşt û dixwarin qalikê wana di derî ra diavêtin derva. Xort û zarokan mîna pisika li benda mişk, xwe cilê diavêtin ser kalikan û ew berehev dikirin dibirin li ber Têyro dikirin quç. Paşê ew dibirin ser kanîyê dişûştin, li hev parve dikirin û bi kêf û şahî dixwarin. Yek ji wan xortana Têyro bû. Ew î çardehsalî salî bû û wekî qeda bû. Ew serekê xortan bû. Ew î li ser xwe bû û li hing û şeran



digerî. Ew î pit bû û bi lez û bezê di ser hemsalên xwe ra bû. Deh-danz-de xort li dora wî hebûn û gîştika li dest û devê wî mêz dikirin. Têyro bi hevalê xwe va li pêşîya dukana, li ser quçek kevir û kuçik rûniştibûn û sohbet dikirin û li benda qalikan bûn. ‘Tep’ dengê qalikên hat. Ew ji hundûrê dukanê avitibûn derva. Du-sê xortan bi hev ra bezîn xwe avêtin ser qalikan, û ew ji dest hev rakişandin û bi lezekê anîn dan ber Têyro.

Têyro, bi serî û çavan hîşmar da du xortan:

– Vana bibin li ser kanîyê bişon û bînin!

Du xortan cîlê Qalik birin li ser kanîyê şûstin û anin dan Têyro. Têyro ew adilane li xortan parva kirin. Gîştkan tevehev bi kêf û şahî binîyê qalikan rûçikandin xwarin. Dengê xîrexîr û malçemaşça wana belav dibû.

## 5. LI SER KANÎYA GUND NÎVÊ ŞEVÊ / HÎVERON E:

Têyro, wexta ku xwandevanên gund havînê ji bajêr dihatin gund û civîn çêdikirin, bi hewês tevê dibû. Wî bi xwîna mîyên ku bo îda qurbanê hatibûn serjêkirinê, li ser dîwarê kanîya gund parola, “Bijî Azadî” nivîsî bû. Cara yeka bû ku li gundê Mêrzan bi

kurmancî paroleyeke ha hatibû nivisandin.

Wêneyên dema raborî Têyro li ser dîwarê kanîyê bi nîvê şevê li ber şewqa hîvê paroleya “bijî azadî” dinivîse, hevalê wî Quto jî berdestikîya wî dike.

**Quto:** Lo Têyro te va arenga (boyax) ji ku derê pêyda kir?

**Têyro:** Xwîn e xwîn!

**Quto** ecêb ma û got:

– Çi, te go xwîn e! Xwîna çi ye lo?

**Têyro** bi awayekî ji xwe bawer Xwîna pêz e, pezê qûrbanê!

**Quto** matmayî li Têyro nêrî serê xwe lirast û çep bakir:

– Lo te çing şike vê bir!...Ma te niha çi nivîsand?

**Têyro:** Bijî azadî!

**Quto** pêçekê bédeng ma, paşê gona Têyro hece bî hece, bi– jî aza-dî dubare kir:

– Ew çi ye lo, tê çi menayê?

**Têyro:**

– Yanê ‘bijîne serbestî’ yan jî tê menaya ‘tim hebe serbestî!’

**Quto:**

– Malava, çima wer nanivîsînê?

**Têyro:**

– Bijî azadî ê sîyasî ye, kurmancîya defterê ye!

**Quto:** Ma te va ji kê hînkir?

**Têyro:**

– Ji Gelhoyê Hesênê Mistê!

## 6. JÎ PÊŞ MALA MIXTÊR BER BI MEYDANA LI BER CAMÎYÊ:

Ji nişkava jîpek û cemseyek eskerîyê hatin li meydana ber camîyê dawestîn û jê da cendirme bi lez peya bûn. Têyro hema bezîya çû xeber da mixtêr. Civata li odeya mixtêr bi lez di hevra bû û berbi camîyê bi rê ket. Mixtêr bi rê da xwe gihande Têyro.

### Mixtar:

– Têyro here nav gund bane mêran ke, ma werin vira.

### Têyro:

– Tê heqê min çi bidi?

### Mixtar:

– Heqê çi ye?

### Têyro:

– Tu dizanî heqê çi ye!

### Mixtar:

– Ez ê du panknot nîva bidim te!

Têyro bi serî bakirinê nerazîbûna xwe nîşan da:

– Dudu û niv hendik in, bike pênc!

Mixtar ji tirs û teleşe va nexwazt ku dirêj bike û bi Têyro ra têkeve nav bazarîyê, serî hêjand:

– Erê erê, ezê pênc panknota bidim te, de zu here!

Têyro bi firîskîyê bane hevalên xwe kir. Koma xortan bi lez û bez li nav gund belav bû.

## 7. LI MEYDANA LI BER CAMÎYA GUND RO JÎ NÎVROYÊ HÎNDİK DAGERÎYE:

Pêçekê şûn da, mêrên gûnd li meydana ber camîyê kome serhev bûn.

Sercendirme û dû cendirme li hêlê, li pêşîya koma mêran dawestîn. nehûdeh cendirme din jî li dorûpaş koma mêran wisa mewzî girtin, te yê bigota, wana dor li dijmin hewş kiriye.

Sercenderme dest li ser qunê, seq vekirî û sîng belkirî bi tirkî û bi dengê qewe û azarkar dipeyivî. Dengê wî geh bilind geh jî nizm dibû. Dema ku dipeyivî serîyê xwe li hewa digerland, li çavên guhdaran nedînêrî. Ew merivekî bejnqut, pît û rûtahl bû.

Sercendirme hewayê li pêş camîyê ji tirsê bar bû. Bêdengîyeke bi xof dagirtibû ser meydana ber camîyê:

– *Eskere me yê bi şan û şobret dest dayê ser têxt û ferman daye ku welêt ji kominîst û cihêxazan (bolucuyan) pak bike. Em ê koka wana bînin. Em dizanin di malê kê da sileh û kîtabên qedexe hene û ki kominîstî û cihêxaztî (“bolucutî”) dike. Her kes rojekê pêş da sileha xwe teslîm bike û kesên kominîst û bolucu îxbar bike. Na, heger we wer nekir em ê dûnyê bi ser we da bixelînin!.*

Di wî devî da, zirînîya kerê Sis-to li derdorê belav bû. Zirînîya kêr dengê sercendirme birî, gotinên wî

êdin nedihatîn bihîstinê. Sisto şivan bû û ji ber pêz dihat. Ew tim li çolê bû ango ji civîn û civatan dûr mezin bûbû. Wekî ku tê gotin, wî pir hay jê tu tiştî nebû. Ew î pozpan û sim-bêlçardeqkî bû. Ew î hindik şûlêrsist bû. Lewma jê ra digotin, Sisto. Navê xwe yê heq Misto bû. Kerê di bin wî da, bi hemû hêza xwe ji hundur da û bê navberdayîn dizirî, mîna ku tê gotinê, ziriniya wî bi dûnyayê da. Ew li tilis berbi koma mêran dihat. Manke- rek di aljorê koma mêran ra, li kêle- ka xaniyê Mixtêr dawestîbû û bi ber çavên wî ketibû. Wî li ber xwe dida ku xwe bigîhîne wê, zept nedibû.

**Sisto** bi şivê li stû, gûh û seriyê kêr dixist û pê ra jî bi wêrinî bi kêr ra dipeyivî:

– Çûş çûş, de min û kêfî vî. Li ber camiyê meşer e, dilê yê bin min jî manker e!

Lê ker ji ya xwe danagerî û zirini neterikand.

Bi ser vê gotinê da, vîq û vîq û hîq û hîq kenekî bi koma mêran girt.

**Mixtêr** berê xwe berbi Sisito kir û bi hêrs serî tê ra bakir û bi dengekî bilind banê kir:

– Lo Sisto, dengî kêr bibire! Ey- be lo, va çi şûler e!?

**Sisto:**

– Ne bi destê min e lo, yê di bin min da zept nabê, ew î nasekinê î

harinî bûye, harinî! Mixtar, carkê kêr cibihîle, xwedê kî we tu der nedîtîbû ku hun li vir kombûne û we meydana gund zept kiriye û rê li ber me girtiye. (pê ra jî serê xwe vir da û wê da hêjand).

Di saya ziriniya kêr û şor û şûlera Sisto da, pêçekê ewrê tirsê bel- av bûn, ken bi rûyê mêran da hat. Kêrê Sisto bi lez xwe li nava koma mêran xist, civat li ber bû du aliya û ew derbase hêla din a civate bû. Wexta ku rê li ber vebû û manker jê va xuya kir, ziriniya wî hinek kêmbû. Sercendirme bi ziriniya kêr, bi kurmancî peyivîn û kenîna mêran pir xûlî (hêrs) bû, pê heta dêv hat. Çav di serê wî da dilistin. Wî dest pê zixêfan kir, bi tirkî got, “*dilînzî eşek sîksîn!*” (ker di zimanê we ne!) Koma mêran xwe li kerri na, ji xey- rî Merdo tu kesî nexwazt ku zixêfên sercendirme bibihîze. Merdo xwe zept nekir; pekî meydanê.

**Merdo** bi dengêkî pît bersiva Sercendirme da:

–Tu heqê te tune ku zêxfî ji zi- manê me ra bikî. Ez gotina te li te vedigerînim!

Mixtêr û çend mêran xwe avêtin ber Merdo û xwastin ku dengê wî bibirin.

**Mixtar** bi tirs û hêrs:

– Lo lo hîş be, meke, ma tu dîn

bûyî çî! Me tu tişt nebihîst, tu jî mebihîze! Tu mecburî ku her tiştî bibihîzî!!

Birayê Merdo, Hesen jî bi hêrs xwe gihande Merdo, bi şelmaqkê 'şîng' li bin guhê wî xist.

**Hesen** bi hêrs û pît û li dû hev:

– Çi şor di te da nasekinine, bi çîyê te ketiye, de kê m bibe here! Here ma çavên min te nebînin!

Merdo şor tê da nedisekinîn. Derdora wî jê ra digotin, “Devsisto”. Wî bi xwe jî carina digot, “vî devî pir bela anîne serî min. Ne bi dest min e, ezî pê nikanime. Ez bixwazim jî, nikanim wî bigrim, ewî bi serî xwe ye. Merdo bi şelmaq û şorê Hesen pir êşîya lê dest li ber birayê mezin helnena. Bi hîşmardayîna serdarê wana, cendirman beristin Merdo, ew girtin, dest kelepçe kirin û çeng kirin avêtin hundirê cemsas eskerîyê. Koma meran çû malê xwe ku sîleha bînin.

## 8. LÎ RÊYA BERBÎ MALA HESEN:

Hesen, bi lez dev da rêya mal. Bi rê da, xwe bi xwe ra deng dikir.

– Gelho Gelho, serê min kire ber min. Bi wî nebû, niha jî birê min î devsist, Merdo jî li ber cendirma heldinê; ew jî ku belayeke din bîne serî min. Kerî ji kera, dêv bigrî qûna deng ke. Of of of!

Tirsê xwe li Hesen pêçawû, ew bûbû êsîrê wê. Hesen kîtabên Gelho û sîleha ku ji bavê da jê ra mabû (barebêl) kiribûn çûwalekî û di baxçê xwe da kiribû bin erdê. Dîsa jî ew ne yî rehet bû û ditirsî ku cendirme werin lê bigerin û bibînin. Wexta ew gihêste mal, bange lawê xwe, piçûkê Gelho kir. Bi wî va tevr û bê helnan çûn bêxçe. Çûwal ji herdê derxistin û vekirin. Hesen sîleh ji çûwêl derxist, pêçekê lê mêz kir û di destê xwe da vir da û wê da çerx kir, paşê ew dirêjî lawê xwe kir.

**Hesen** bi dengê kelegirî:

– Lawê min, va yadîgara bavê min e, helne peve bide mixtêr, ma wê teslîme cendirman bike!

– Axxxx, ax!

## 9. LÎ HUNDURÊ AŞXANA MALÊ HESEN DANÊ ÊVARÊ:

Hesen qerar dabû ku kîtabên Gelho bişewtîne. Wî çûwalê tijî kîtab helna avête ser piştê xwe bire xanîyê aşxanê. Jina wî, Kewê li aşxanê nan lê dixist. Kewê jineke dilsoz û hindik jî saf bû. Cawîya wê, jina Merdo, Xecê jî li ber destê wê diçû û dihat. Wê geh gogên hevîr qolot dikirin, geh bi destîvê kix, kês û xişik diavête ser arê binî sêlê. Hesen kete

aşxanê, çûwal deyna erdê. Kewê û Xecê berbi wî mêz kirin.

**Hesen** bi dengêkî lerizî:

– Cendirman Merdo girtin!

Kewê, gava ku va bihîst, bi mistê li sîngê xwe xist, kire hawar û bi lome li mêrê xwe kir.

**Kewê** bi mistê li sîngê xwe xist û kire wêrinî:

– Wîh! Xwedê neke! Lo lo va çi bêtar e ku têye serê me! Tu yî li ber çi bûyî, te çima hîşt ku cendirme Merdo bigrin?

**Hesen** bi hêrs:

– Sucê birayê min e. Merdoyî devsist, tê bibêjî, ar û nemûsa vî gundî ji wî tê pirsikirinê! Devê wî bi serî xwe bêtarek e.

Xecê serî berbi jêr, bi awayekî bixwedaketî li pêtiya arê binî sêlê mêz dikir. Ji tîyê xwe fedî dikir, lewma deng jê dernediket. Hesen çûwalê kîtaba da hêla Xecê.

**Hesen** bi dengêkî pît fermandar:

– Va kîtabên Gelho bişewtînin! Ma belayeke din jî ji av û rûyên vana da neyê serê me!

**Kewê** destên xwe vir da û wê da dihêjandin; di destekî da gogek hevîr, di yê din da dox:

– Wêy, dibe, ne ku Gelho bibihîze ê ji me ra yê nemayî bibê; ew ê pîr pê biêşe!

**Hesen** sor bûbû, dest û ling dicirîfîn, bi awayekî azarkar:

– De hîş be! Dengê xwe bibirê! Navî wî eqî (pîsî) helmede. Mala minê, Gelhoyî te dê pê biêşe. Çima ew bi me neêşê, bi me!!!

**Kewê** bi dengêkî nizm, bi pilte-piltkî û bi awayekî bi xwe daketî:

– De em ê xêrnedî bibên çi! xwandina me tune, em çi dizanin ku di nava van defteran da çi heye. Tim dixwand, min digot, ez qurban zêde mexwîne çavên te gune ye. Êdî ez a bi Gelho ra bibêm, em mecbur man. Ez a bibêm, defterên te di arê da neçûn, qet nebe me pê teştê nan lêxist!

